

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 69 | 2017



Kitêbên kurdî
yên dersê
ji weşanxaneya Apecê



Weşanxaneya APECê
<http://apecpublishing.com>

BIBÎRANÎN



Dr. Nebî Kesen (1963 - 11.09.2012)

Wekî ku tê zanîn, hevkar û nivîskarê *Bîrnebûnê*, hevalê me, **Dr. Nebî Kesen**, çî gune ye ku roja 11.09.2012an dinya xwe gûherî û ji ebedîyê ra, ji nav me çû bû.

Ew ê bi şênahîya 20 salîya Bîrnebûnê pir şa bibûya.

Em wî bi vê minesebetê, bi giramî bibîr tînîn!

Ruhê wî şad be!

Koma hevkarên Bîrnebûnê

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 69 | 2017

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Muzaffer Özgür, Xizan Şilan, Memê

Mala Hine, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Dr.

Sozdar Mîdî (E. Xelil), Mustefa Reşîd, Altun Başaran,

Hesenê Metê, Nurşen Genççağa, Rohat Alakom, Fawaz

Husên, Reben Celikan, Adem Özgür, Seyîdxan Anter,

Ayşe Gul, Rûjhat Esîman, Amed Tîgrîs, Hesen

Huseyîn Deniz, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkilî/Kontakt

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro—Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Basku: Apec-Tryck AB



Wêneyên bergê: Bekir Dari

Nav: Hücreyên jîyanê

Bat: 40 x 40

Têknîk: Lêbkkirin (Multi mix)

Material: Boyaxa Acryl li ser paç.

Ev ji bo 20 saliya kovara Birnebûnê hatiye çêkirin.

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tèn, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- | | |
|-------------------------------------------------------------|--------------------------------------------------------------------------|
| Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçi | 34 Li ser bîstsalîya Bîrnebûnê
Memê Mala Hine |
| Manîfestoya Bîrnebûnê 7
Seyfî Dogan | 37 Şeva tarî
Seyfî Doğan |
| Ji bo bîstsalîya Bîrnebûnê 9
Hesenê Metê | 41 Hespên westîya
Seyfî Doğan |
| Tu herbebî Bîrnebûn 10
Altun Başaran | 44 Pêkenî – Serhatî
Nuh Ateş |
| Nasnameya me bi Bîrnebûnê ra 13
Nurşen Genççağa | 46 Bêjenasiya gotina Kurd
Amed Tîgrîs |
| Bîst sal berê 17
Dr. Mikailî | 49 Ê Pollyanna xokuşî kird
Rûjhat Esîman |
| 25 Îlonê 20
Seyfî Doğan | 52 Li Swîsrê hîndekarîya kurdî
Hesen Huseyîn Denîz |
| Bîstsalîya Bîrnebûnê pîroz be! 21
Kurdo (Fawaz Husên) | 58 Kilamên me
Mem Xelîkan |
| Kovara Bîrnebûn dengê Anatoliya Navîn 23
Rohat Alakom | 60 Quncikê Aşgozelê
Ayşe Gul |
| Bîrnebûn û KAN 24
Mem Xelîkan | 61 Ey êşno!
Xizan Şîlan |
| Ew hîssîyatê ku Bîrnebûnê di dilî me da 26
Reben Celikan | 62 Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da-3
Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) |
| Bîstsalîya Bîrnebûnê 27
Nuh Ateş | 65 Hekat
Seyîdxan Anter |
| Bîrnebûn û xalê min Mizaffer 29
Adem Özgür | 68 Berî Referandûmê notên gera Kurdistanê
Vahit Duran |
| Çend gotin ji bo Bîrnebûnê 31
Muzaffer Özgür | |

Ji bîrnebûnê

Di arifeya referanduma ku dê li başûrê welêt di 25ê payîza pêşîn de bibe ev hejmar bi pîrozbahiyên bîstsaliya kovara Bîrnebûnê derdikeve. Erê, bîst sal berê, birêz Hecî Erdoğan bi daxûyaniyeka ku di rojnameya *Özgür Politikayê* de belav kir gaveka pîroz avêt! Em li vir careka din ev keda wî ya destpêkê bi vê munasebeta salvegara bîstsaliya kovarê bi bîr tînin û dibêin; Hecî tu her hebî û ev gava te ya dîrokî her pîroz be!

Di van bîst salan de bi harmoniya di nav hevkarên kovarê û bi pîştewaniya hevalbend, dost û nivîskarên kurd ev karê hevbeş hat kirin. Ez ê nikaribim navên giştikan li vir rêz bikim. Lê dîsan jî divê hinek navan bi bîra xwendevanên kovarê bînim.

Ji destpêkê de hem bi pênûs û hem jî bi firça xwe, Bekir Dari kedeka xwe ya mezin di nav hejmarên kovarê de heye. Ji derveyî koma hevkarên kovarê, Mehmed Bayrak, Altun Başaran, Rohat Alakom, Mahmûd Lewendî, Hesenê Metê, Seyîdxan Anter, Fawaz Husên, Amed Tîgrîs, H. Hüseyîn Deniz, Hecî Akman, Adem Özgür û bi sedan kesên din keda wan li ser Bîrnebûnê heye û ew her hebin!...

Ji bo pîrozbahiya bîstsaliya kovarê di vê hejmarê de ji hevkar, nivîskar, hevalbend û xwendevanên kovarê bi dîtînin û bîranînen xwe ev bîst salên kovarê bi pêşniyarên hêja şirove kirine, mala wan hemûyan ava!

Bi hêviya ku em bikaribin jiyana kovarê dirêjtir û naveroka wê xurtir bikin, bîstsaliya kovarê li we hemû hevkar, pîştgir û xwendevanên kovarê pîroz be!

Li seranserê welêt û li diasporayê kurd bi kelecaneke hesreta sedsalan li benda encama referanduma ku dê li başûrê welêt di 25ê payîza pêşîn de ne.

Kurdistan cara yekem di 1639an de di navbera împaratoriyan fîris û osmaniyan de û dûra piştî şerê cihanê yê yekem di navbeyna Tirkîyê, Îran, Iraq û Sûrîyê de hat parçekirin. Di van herdu şeran de jî sozên azadî û serxwebûnê dabûn kurdan, lê kurd her hatin xapandin.

Îro jî li ser axa Kurdistanê ji ber berjewendiyên gelek welat û hêzan li dijî referanduma serxwebûna başûrê welêt Tirkîyê, Îran, Iraq û Sûrîyê bi tehdîtwarî sekinîne.

Kurdan ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê pir bedelên giran dane Serxwebûna başûrê welêt ê rêya azadî û serxebûnê li hersê parçeyên din ên welêt veke. Û eva dê bextiyarî û nasnameyeka netewî di nav kurdên Anatoliyê de jî bi hêztir bike û baweriyeka xurt li cem wan peyda bike.

Bi hêviya ku rojek ji rojên ne dûr ev referanduma li başûrê welêt bibe nesîbe bakûrê welêt û kurdên Anatoliya Navîn jî, referanduma 25ê payîza pêşîn li gelê me pîroz be!

Ali Çiftçi

Manîfestoya Bîrnebûnê

1. Avakirina zimanekî hevpar
2. Pêşxistina zimanê xwe
3. Bidestxistina derfetên ku em ê çawa xwe baştir îfade bikin.
4. Pêşxistin û peyda kirina gotinên ferhengî
5. Dewlemendkirina ramanên piralî
6. Têgîhiştin, nasîn û danasîna xwe
7. Ji bo derbirîna hîsên xwe pêwîstiya me û hinek alavan
8. Ji bo çêbûna nasnameyekê kolektîf
9. Ji bo ku nebin qurbanê wendabûna raman û hizireke kolektîf
10. Peyda kirina nirxên hevpar û normên wê
11. Xurtkirina nasnameya kulturî ya navçeyî
12. Peyda kirina referansa takekesî û dewlemendkirina jiyana wan.
13. Alîkariya ji bo takekesan ku baweriya xwe bi xwe çêbe.
14. Xurtkirina danûstandina di navbera nifşan de
15. Bidestxistina mîrasiya xwe ya kulturî
16. Parastina mîrasiya xwe û ragîhandina ji bo nifşên dahatû
17. Ji bo ku wenda nebe, kar û xebata ji bo mîrasiya kulturî were nivîsandin
18. Pêşxistina mîrasiya kulturî
19. Xebata ji bo berdewamiya tarîxa xwe
20. Rabestina li hemberî asimîlasyonê û pêşilêgirtina wê

*Seyfi Doğan
bi wergera Hesênê Metê*

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

Referandum li gelê kurd pîroz be!

Îro li ser ruyê vê dunyayê xelkê herî mezin kurd in ku bêyî dewlet mane.

Kurdan ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê pir bedelên giran dane, derbider bûne û ev pêvajoyê mixabin hîn jî berdewam e.

Referanduma ku dê li başûrê welêt di 25ê payîza pêşîn de bibe, em pir pê dilşa ne û me hêvî heye.

Ev destkeftin û ev serkeftin ji bo me hemû kurdan e.

Û eva dê bextiyarî û nasnameyeka netewî di nav kurdên Anatoliyê de jî bi hêztir bike û baweriyeka xurt li cem wan peyda bike.

Xelkê kurd ê bi vê yekê pir û pir serbilind bibe!

Koma hevkarên kovara Bîrnebûnê
Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê

12ê payîza pêşîn 2017



Ji bo bîstsaliya Bîrnebûnê

Hesenê Metê

20 sal, 69 hejmar, 5550 rûpel... bahsa kovara kurdên Anatoliyê dikim: *Bîrnebûn*.

Ev pêncsed sal in ku kurdên Anatoliyê bêyî defter, bêyî rojname, bêyî kovar jî zimanê xwe, çanda xwe û jiyana xwe ya kurmanciyê ji bîr nekirine. Lê îro bêtir îman pê heye ku ew ê ti carî ziman û çanda kurdî li ba kurdên Anatoliyê wenda nebe û neyê jibîrkin. Lewra teknîka îro, bi parçe û pîneyên din re danûstandinên xurt, derketina kitêb û kovaran jî alîkarên vê yekê ne ku ziman û jiyana kurmanciyê ew ê her li ba kurdên Anatoliyê bimîne.

Di van bîst salan de *Bîrnebûnê* mîsîyoneke baş daye ber xwe û jiyana xwe dirêj, hejmarên xwe zêde kiriye. Xwedê zêdetir bike. Ku em rojnameyan nebêjin, bi vê berdewamiyê, jiyana kovarên çand û kulturî di kurmanciyê de gelek kêr in an jî negêhîştine vê hejmarê.

Eva bêguman berî hertiştî bi ked û harmoniya hebûna redaksiyonekê çêbûye. Ji xirecirên siyaseta rojane

dûr, redaksiyonê berê xwe daye çand û kultura kurdên Anatoliyê. Di *Bîrnebûnê* de gelek ezîz û ezîzeyan bi kurmanciyê xas û gelek gotinên xwe î resen bahsa tarîxa xwe kirine: ji koçberî û cil û bergên xwe heta kevir û kêlên goristanên xwe, ji marîfeta rabûn û rûniştinên xwe heta eşîr û serpêhatiyên xwe, ji bîr û bawermendiyên xwe heta çîrok û helbestên xwe, ji wêneyên kevn û dîrokî heta henek, şîn û şahiyên xwe di *Bîrnebûnê* de nivîsîne û danîne ser hev.

Bi ked û xebata nivîskarên xwe, bi redaksiyona xwe, bi berpirsiyarê xwe Hecî Elî Çiftçî û bêguman bi hebûna Apecê... *Bîrnebûn* bûye ansîklopediyêke dewlemend, bûye ansîklopediyêke kurdên Anatoliyê. Herkes dikane bi hêsanê ji evê ansîklopediya mezin îstifade bike, lê nemaze ji bo sosyolog, dîrokvan û lêkolîneran hebûna *Bîrnebûnê* hêjayîyeke giranbuha ye.

Bi hêviya ku *Bîrnebûn* jiyana xwe dirêjtir, hejmarên xwe zêdetir bike, bîstsaliya wê pîroz dikim.

Tu her hebî Birnebûn!...

Altun Başaran

Rojek ji rojên 2001ê bû min nû dest bi nivîsandina kitêba xwe ya li ser jîyana min a bi navê *Altuns tre liv* (*Sê jîyanên Altunê*) kiribû, nivîskarê me Rohat Alakom ji min re got; kovareka ji bona kurdên Anatoliya Navîn, bi navê **Bîrnebûn** derdikeve, li weşanxaneya Apecê ku xwediyê weşanxanê kurdekî ji aliyê we bi navê Ali Çiftçi ye, tu nas dikî? Min got; na ne Ali ne jî Birnebûnê! Got; were em herin wira. Em çûnî, min cara siftê li wir kovara Bîrnebûnê dît, kêfa min jê ra hat! Hen nivîsên wê bi tirkî bûn, ji bo ku min bi kurdî xwendin û nivîsandin nedizanî, ji bona wê zehmet bû xwendina nivîsên kurdî.

Dûre têkilîya min bi kovarê re xurt bû. Me dest bi pêşengeheka (sergîyeka) li ser kultura kurdên Anatoliyê, li Stockholmê, li taxa Fittjayê li Swêdê bi hevkarîya kovara Bîrnebûnê û Mångkulturellt centruma li Fittjayê çêkir. Ji bo sergîyê tiştên me yên bi destan hatiya çêkirin; xalî, balif, gelt, ber, xeftan û fistan, şar û kitan, ji kilavî şivên bigrê heya zengilî stuyê pêz, ji şeyî heriyê bigrê

heta tejî, pîjî kirkît, îdare, fenere, lamba qazê heta Lokisê me ji malên Omera yên li Fittjayê berev kirin. Kurdên ku li taxa Fittjayê rûdiniştên piranî ji kurdên Anatoliyê, ji gundê Omara bûn.

Li vê pêşengehê me bi kinc û kolên xwe quncikeka wekî odeyeka kurda, hertişt tê da, çêkir.

Li vekirinê qralîça Swêdê, Silvia hat, wê vekir. Kêfa wê ji goşa oda me re pir hat. Bi me ra li vê goşê rûnişt û resim kişand. Me bi vê pêşengehê kultur û jîyana kurdên Anatoliyê da naskirin.

Zarokên li vir rûdiniştin kêfa xwe jê ra dihat, nedîçûn malên xwe, wekî xwe li gundên xwe didîtin. Me ji zarokan re kitêbên zarokan ên bi navê *Rindo* dixwend, pir jê hez dikirin.

Paşê me şahîyeka bi xwarin û vexwerin û stranbêjên xwe wekî dawatekê derbas kir.

Erê, min pir dixwest xwandin û nivîsandina kurdî hin bibim. Dîsa bi navê kovara Birnebûnê me kurseka zimanê kurdî bi darxist. Nêzî 20 kesên ji kurdên Anatoliyê,

gîştik jinên me bûn. Mamostê me Ekrem Altin bû. Ji me pir hez dikir. Digot: we gotinên kurdî rind parastine, bi we serbilind im ku we weki mîrasekê ev gotinên xweş parastine. Em ji

Ekrem xwendin û nivîsandina kurdî evisîn. Ekrem jî gotinên me evisî.

Dûra min dest bi reportajan kir bi kesên ji zûda hatibûn Swêdê. Di 20 hejmaran da nivîsên min he- ta niha çêbûn. A siftê di hajmara 16an de, *bi Kadir Çelik ra sohbetek*, li salên 60î çing wekî karkir hatibû Swêdê, zor û zaxmetiyên wê wextê kişandî vi me re par kir. A didûya di hejmara 17an de *hevpeyvîn bi kevnserokê şaredariya (beledîya) Omaran, Mistik Barlas re* hat weşandin. Wî ne xwendin, ne



Ji pêşengeha kultura kurdên Anatoliyê ya li Fittjayê, qraliça Swêdê Silvia û Altun

jî nivîsandin dizanî, lê bûbû reîsê beledîya Omera. Omera di sala 1955an de bûbû beledîye. Dîsan sohbetek bi çend jinên ji aliyê me bi sernivîsa *Em zarok bûn bûnî bûk*, di hejmara 18an de bi Elife Koç ji



Ji pêşengeha kultura kurdên Anatoliyê ya li Fittjayê, Altun Başaran û Seyfî Doğan

gundê Hecilera, Zeynep Tümtürk ji gundê Omê bûka Calebê, Eyşe Keçeci ji Heymanê ji gundê Saz, Saziye Parlak ji gundê Omê, Fatma Ateş ji gundê Omê re hatibû kirin.

Di hejmara 20an de *Çeroka Beqê*. Ez zarok bûm dêmarîya min ji min re digot min jî pir hez dikir. *Li ser çêkirina tevna bi Ayşe Barlasê ra* hevpeyvînek di hejmara 30î de hat kirin. Ayşe Barlas îro ji ba me goç kir û çû ser heqî xwe. Bi vê reportaja bi wê re zanabûna wê ya li ser tevnê ji me ra wek mîrasekê di kovara Bîrnebûnê de ma. Di hejmara 31an de dîsan sohbetek bi Mistafa Topal û Ayşe Topal re li ser hatina wan a salên 1960î weki karkir û jîyana wan a li xeribîyê wek dokument hat berhevkin. Mistafa Topal rehmetî bû, lê jîyana wî ya goçberiyê wenda nebû.

Di hejmara 32an de bi sernivîsa *Şîn û şewat* kilama Fatê Usê ji gundê Omera ku li ser du lawikên xwe gotibû, dîsan di hejmara 33an de bi sernivîsa kilamên şînê, kilama Fatê Xelê ku li ser xwenga xwe gotibû hatin berhevkin. Di hejmara 34an de di şahîya 10-salîya Bîrnebûnê de ku me li Stockholmê piroz kir, cil û bergên bûk, keçik û pîran dane naskirin. *Şînen me*

li xeribîyê, di hejmara 37an de, *Panzdeh salî bûm çûm ser hewîyê*, li ser zorbûna hewîtiye bi Hatice Öztürkê re reportajek di hejmar 39an de hat kirin. Di hejmara 40î de *li ser daxkirinê*, di hejmara 41an de *Rojek ji rojên min*, di hejmara 42an de dîsan *li ser şahîya kovara Bîrnebûnê li Stockholmê*, di hejmara 45an de li ser *8ê adarê, roja jinan*, di hejmara 47an de *Ka çar delalên ber dilê min*, ku li ser çar zarokên bi hev ra di dolabekê de hatibûn fetisandin, hatibû gotin, di hejmara 48an de *12 salî bûm bûme berdêl*, di hejmara 49an de *hevpeyvînek bi Fata Osman Efe* re li ser folklor a me hatibû kirin. Pîranîya van îsanên min pê ra reportaj kirine îro ne li nav me ne, çûne ser heqîya xwe. Lê bi saya kovara Bîrnebûnê, bîrnanîn, serpehatî, jîyana wan a goçberiyê, zanebûna wan a hunerî, klam û derd û kulên wan hatin berhevkin û wek pîranîya mezinên me yên berê bi xwe re nebirin û wenda nebûn!

Mala Bîrnebûnê ava be, umrê xwe dirêj be ku em gîştik bi hev dan naskirinê! Wekê malbata kurdên Anatoliyê, em ji hev pir tiştan evisîn.

Tu her hebî Bîrnebûn, te em ji bîrnekirin em ê jî te ji bîrnekin!...

Nasnameya me bi Bîrnebûnê ra

Nurşen Gençağa

Ji 1997 heta 2017, bîst sal; generasyonêk e... Li civîna yekemîn, paşê bî salan li civînanda hatim dîtin. Lê dûre jiyana min ez bidûrxistim, lê ez tim „peripheri“ dorûber da bûm, jê nebûm. Ev e bîst sal in, geh nêzîk geh dûr, ez tim bi Bîrnebûnê ra bûm. Wê tesîra xwe da min jî. Nîşana wê ya mezin di vê nivîsê de, têdîtin; cara sîftê ye ku ez di emrê xwe de hevqas dirêj bi kurdî dinivîsim. Min qursa îngîlîzî, almanî û kurdî xwend. Kurdîya min ji van zimanan xiravtir bû. Ev motîvasyonê min a kurdî bi Bîrnebûnê ra çebû. Bîrnebûn ne tenê zimanê me yê kurdî li gundê Xalka tê dengkirin bû, ji min ra; ew rêya „xwe“, nasnameyê (Nasname-Identitât) xwe lêgerin bû ji min û Kurdên Anatoliya Navîn (KAN) ra.

Ev ne tesaduf e, Bîrnebûn ji alî nivîskar û rewşenbîrên KAN li derveyê welêt tê weşandin û wan kurdên ji her perçe nasdikirin û bi hev ra karê siyaseta Kurdistanê kiribûn. Ji ber vê yekê xisûsiyeta xwe KAN dikarîbûn zela bîwînin. Mî-

na ku Bernhard Giesen di pirtûka xwe da sernameyekî da î; „*Xerîbên li xerîbiyê*“: Serebûna Taybeta Netewî (*Xerîb li xerîbiyê li nasname xwe vedigerê*) (*Die Fremden in der Fremde: die Entdeckung nationaler Eigenart*)¹ Ew difikire ku, nasnameya çandî (kulturelle Identität) li ser çêkirîna ferq û wekhevîyatîyê çêdibe, bi taybetî kesên li xerîbiyê di nav xeriban da vê ya hîn çêtir diwîne.²

Ew kesên ku Bîrnebûn avakirin ewnê ku, ew kurd in, ferqa xwe bi tirkên û mîlletên din bi her awayî û li her platforman da, anîbûn ziman. Li nav siyaseta Kurdistanê de bi têkîlîya kurdên din ra, wekhevîyatîya xwe, ferqa xwe wek KAN ditîbûn. Kurdên li Konya, Kirşehîr, Ankara, Kayserî, û w e., li pir zuda li wir cîh bûne, tim dihatibû ziman, lê li ser wana pir lêgerîn û hûrniherîn tune bû. Ew a herî girîng ji KAN bi xwe, bi nav, bi karê xwe ew cuda nekirî bûn. Cara yekemîn min ev pirtûka Nuh Ateş (*İç Anadolu Kürtleri*, Komkar, 1992) da dît ku ew bi nav kirina

çandî, aborî, dirokî lekolînakî peyda kir. Ew nîvîsa Heci Erdoğan li rojnameya *Özgür Gündemê* da weşandibû pêş karê Bîrnebûnê bû û ew bi xwe navbavê Bîrnebûnê ye. Navê „Bîrnebûn“ wek yekî ji der ve bê: „bîrnebûn, bîra me da neketin.“Bi wî awayî navekî ne cûda ye. Ji ber ku kovar ji KAN bi xwe û ser xwe derxistî bûn, „me bîrnekir, em wenda nebûn“, hîn li şûnê ne. Tê bîra min me li ser vê, di civînekê da kûr û dîrej niqaş kir, me biryar da ku bimînîn li ser navê „Bîrnebûn“. Ji ber kovar bi vî navî hatîbû naskirin û pejirandin, me gotinek nedîbû, ku maneya kî ne „ji kesên ji der ve“, lê „ji bixwe“ bide.

Nasnameya çandî (kulturelle Identität) ji xwe berê nê meydanê, ew bi awayekî cîvakî tê çêkirin. Çêkirina nasnameyê bi rastî hevhatina kesên „der ve (biyanan)“ bi ferq dest pê dike. Dûra bi lêgerîn, dîtîn, çêkirin û zêdekirina wekhevîyatîya „xwe“ (em) re, tê holê. Wekhevîyatî civateke bi destan yan mirovê dînî, yan hukumdariya siyasî, yan leşkerî, yan rewşenbîr û ê din ra, dikare çêbe. Van grubên civakî, kêmkirina ferqa nav xwe yan pîr kirina

wekhevîyatî bi desta qeydên, urf û edetan, merasîman (Rituale) tînîn cîh, wek yek zimanekî dengkirinê, bi wî zimanî klamên sitranê, kincên wek hev li xwe kirin, yan ambleme xwe dakirin.³

Çêkirina nasnameya çandî li her milletan xisûsi ye; mînak, li Tirkîyê bi destên leşkerên elît ra, yan niha li Ewrûpa bi destên hukumdariya siyasî û rewşanbiran ve, tê çêkirin.

Kovara Bîrnebûnê li çêkirina nasnameya me, Kurdên Anatoliya Navîn ra şunekî taybetî digirê.

Ew kovara yekemîn bû, li rêya me ya „xwe“ lêgerinê da; rêya me çêkirina nasnameya kolektîfî de kevîrê mezin da cîh. Kovara me ya din *Veşer* paşda derket. Ew heyecana kesên ji bo weşandina Bîrnebûnê ra komîhevdu bûn tê bira min.

Di nav me de însanên ji her bîrûbawerîyên dînî û sîyasetên cuda hebûn, lê giştik rewşenbîrên ji kurdên Anatoliya Navîn bûn. Ew rêya ku lêgerîna bersîva pîrsa min a „*em kî ne, ji ku û kîngê, çima hatinî Anatoliya Navîn?*“ ez kişandibûm van cîvanan. Baş bû ku ez di daweta kekê Nuh Ateş de beşdar bûm. Bi dîtina min ew hewceya min Bern-

hard Giesen dîsa baş tîne zimên; „*Ji nasnameya ferdî (individuelle Identität) re nasnameyeka kollektîf şert e.*⁴

Ew kesên kovara Bîrnebûnê derdexin, emegê wan ji me ra pir bi qîmet e. Li rê ê nasnamekî kollektîf ji me ra; kurdên Anatoliya Navin ra, şansê me ye ku ew bi dest rewşenbîrên me çêdibe û ewna gîşt ne mîna hevdu ne. Ji ber vê yekê nasnameya ji dest wana da çêdibe hîn zêde unîversal e, fireh e. Pirsra me kurdîyatîyê ve girêdaye. Kurdên li her pêrçe ê le xisûsiyetê me hene, ku em wana bixwe

derhinî holê, ne tirkên Anatoliya Navîn ne kurdên Kurdistanê li vir wek me dijîn.

Kemasî hene? Hene, rê direj e?, direj e, lê em bi xwe rê de ne. Bi wî awayî ez 20-salîya Bîrnebûna me pîroz dikim. Ew rêya me ya nasnameya çandî lêgerinê da, ew dimê yan namê nizamim, le ew rol â xwe ji niha da awa kir, ji bo vê ez wek kurdeka ji Anatoliya Navîn, reşwan û xalîkan sipasîyeka mezîn, silavên germ ji rewşenbîrên me yên vî karî dikin re dişînim.

Jêrenot

¹ Giesen, B. (1993), s.98

² *Kulturelle Identität beruht auf der Konstruktion von Differenz und Gleichheit im Hinblick auf fraglos geltende Grundlagen der Verständigung. Auf ganz elementare Weise wird diese Differenz zwischen innen und außen in der Begegnung mit Fremden konstruiert, die scheinbar offensichtlich anders sind, andere Kleidung tragen, andere Sprachen sprechen, andere Speisen essen und fremde Embleme tragen. In dieser Begegnung mit dem Fremden wird die eigene Zugehörigkeit zu einem Kollektiv besonders deutlich erfahren. Dies verstärkt sich gelegentlich noch zu einer doppelten Fremdheit, wenn man den Fremden auf einem Gebiet begegnet, auf dem auch diese fremd sind.* Giesen,B. (1992), s.131

³ *Auch wenn sie den Mitgliedern einer Gemeinschaft als elementar und natürlich erscheint, ist kulturelle Identität nicht natürlich gegeben, sondern wird in bestimmten Situationen von bestimmten Trägergruppen sozial konstruiert.....hier vor allem für Intellektuelle als Architekten und Träger einer kulturelle Identität Europas..... Kollektive Identität beruht nicht nur auf der Erfahrung von Differenzen und Grenzen zwischen innen und außen, sondern auch auf der Überwindung interner Verschiedenartigkeit und der Herstellung von Gleichheit und Gemeinsamkeit. Die gleiche Zugehörigkeit zu einer Gemeinschaft ist eben nicht natürlich gegeben, sondern muss sozial konstruiert und immer wieder bekräftigt werden. Eine zentrale Stelle bei der sozialen Konstruktion von Gemeinschaftlichkeit nehmen Rituale ein. Die identitätsstiftende Kraft von Ritualen beruht nicht nur auf ihrer Gleichförmigkeit, sondern... Giesen, B.(1992),s.134*

⁴ *Die kollektive Identität der Gemeinschaft bot dem freigesetzten und unruhigen Selbst einen festen und unüberbietbaren Stand; erst auf dieser Grundlage konnte sich individuelle Identität bilden und entfalten. Giesen,B.(1999),s.11*

Çavkanî

Giesen Bernhard, *Nationale und kulturelle Identität*, 1992, Suhrkamp Verlag: Frankfurt am M.

Giesen Bernhard, *Die Intellektuellen und die Nation*, 1993, Suhrkamp Verlag: Frankfurt am M.

Giesen Bernhard, *Kollektive Identität*, 1999, Suhrkamp Verlag: Frankfurt am M.

Bîst sal berê

Dr. Mikailî

Ji bîr newû...

Ez diwê m qey mîna gavikê, demikê derbas bû, bîst sal berê wexta ku min di rojnameya *Özgü Politikayê* da ilana, reklama derketina kovarê bi navî Bîrnebûnê dî, pêşta min meraq dikir; gelo ew kî ne çî ne?

Di îlanê da di nav niviskara da navê bi nas hewûn, wek I. Güçlü, H. Yaşar, M. Bayrak.

Dû ra min ji Xaço (Nuh Ateş) re telefon kir, ka ew di derheqa vê da çî dizane, em ê çito piştgirîyê bidin vî karî, ku em li bendê wûn, berî çend sala ji bo vê jî li bajarê Köln a Elmanya bi komik heval va li hev civîya wûn. Wêngê birêz Nuh Ateş banî me kiriwû.

Li piştî banga, îlana derketina kovarê demek dirêj tu deng jê derneket, li ser vê me dîsa bi Nuh Ateş va deng kir ku em ê bangeka nû bikin û bangî kes û hevalên ku di heşî wan da, mêjûyî wan da ji bo vî karî hezkirinek heye.

Di sala 1996 wû, li Duisburgê di Cafê Museum da me salonek girt û yekûyek ban hevalan kir. Qasi 15-20 kes hatin, di nav wana

da H. Yaşar, M. Bayrak, Nuh Ateş, M. Özgür, Hacı Erdoğan, Hüseyin Kalaycı, Vahit û Cahit Duran, Nurşen Kaya, Suna Duran, Bekir Dari û ez hewûn. Hîn navê ku di bîra min da nemanê jî hewûn, lê bira ew qusura min efkin, pîrr wext ser ra derbas bû. E ku hatiwûn gî bi biryar hatiwûn; ew ê derketa!

Wek nav GAWESTÎ jî hat niqas kirinê, lê ji ber ki ew salekê berê wek “Bîrnebûn” hatiwû ilan-kin, bi pirranîya dengî hevalan nav wek BÎRNEBÛN ma!

Bi heyecaneka mezin me hema beyî ku niqaşeka mezin, meselê dûr û dirêj bikin, di nav xu da wezîfe parve kirin, ji bo derketina kovarê pere hewce wûn, me ew berhev kirin, hineka wêngê, hînika jî dû ra ji hesêw ra, bi rîya banqê şandin.

Hîn nivîsên ku destî me da wûn têra derxistina kovarê nedikirin. Wê royê ji me pîrr hevala ji zarûriyetê, dest bi nivîskarîyê kirin. Ez jî di nav da.

Li gor gotina H. Erdoğan; li Stenbolê hevalkî bi navî İhsan Türkmen, ji Xelika û dîsa navê wê

xanimê ne li bîra min da maye, lê ji komela li Stenbolê hinik nivîs bi daktiloyê rêzkirûwûn, lê gere yek biçûya û ewna bihanîyana.

Ez ji bo vî karî çûm Stenbolê di pasaja Elhamra, li ser Istiklal Caddesiyê da ewna dîtîn. Di destî wanda tenê nivîsa I. Güçlü, Mehmet Bayrak û ya Hatice Yaşarê hewûn.

Dûra çûm Polatliyê, hindê Osman Alabay (Curukî), kurd-perwerekî ji Yunak-Konyê, lê li Polatliyê dima û bi kîrîn û fîrotina ce-genim va debara xu dikir, merikî ji berê va min nasdikir, dema li Polatliyê meriya qala kurdîtîyê dikir, tenê ew hewû, ew dihat bîra meriya. Wî tim di nav xelkê da jî çîrok, destan, klam û stran, gotinên mezina berhev dikir û dinivîsin jî. Lawî wî Kenan jî ji berê da di navî karê Kurdîtîyî da bi avakî aktiv dimeşîya, kardikir û ji bo vê di cunta 1980yî da jî bi qasî heşt sala di hepsa Diyarbekirê da raketî wû. Em çûn mala wî, min ji wî ra qala kovarê kir, ew bi vê pîrr şa bû, di destî wî da çar defter hewûn, wî gîştik bi desta nivîsandi wûn. Ji xencî kultur û çanda kurdên Anatolya Navîn, şîir û nivîsên wî jî hewûn. Lê ew ditirsya wana bidî min. Ji bo yî ku berê jî wî hindik tişt ji bo yî

çap û weşanê dawûn kesan û ew wînda biwûn! Mi got; ka tu bide min ez biwim wana kopya bikim û dîsa ji te ra bînim.

Bi vê razî bû, dilê mi neşkênand. Di wê wextê da tiştikî bi kurmancî li derkê, di dukaneka Fotokopîyê da kopî kirinê pîrr bi tirs û rîsk bû. Wekî nika di her malê da ew imkan tune wû. Mi bi alîkarîya dost û hevala lê pîrsî û hukir ku, hin kesên islamî, musulman hene, meri dikari bê tirs li ba wan, li dukana wana bidî kopîkirinê. Ez çûm dukana wana li ser Cumhuriyet Caddesi ya Polatliyê. Mi ji wan ra qala vê kir, wana hinkî bi tirs, emma lê dîsa jî ji wana defterik kopî kirin, dan min. Min orîjînalê defterê dîsa wê royê bir, da Apî Osman. Em herdû jî pîrr şa wûn. Min bi wî va dîsa roportajik jî çêkir. Qaseta dengî wî hîn li ba min e. Rehma Xadê lê bi!

Me li Polatliyê bi kesên ku ji bo vî karî amade wûn ra deng kir. Heyecanik pîrr mezin di nav gel da hewû, vê quvvet da min jî.

Dîsa lawikekî Osman Alabay, Behram jî li Polatliyê dukanik xu yê kitêwa vekirî wû. Ew jî paşê ji bo fîrotin û belaw kirina kovarê bû navendik.

Ez bi barî xu yî giranbuha va bi

tirs ji gumrika Tirkîyê derbas bûm, hatim Elmanya. Karê pratik a çap û logoya kovarê Vahit Duran, Cahit Duran dan ser xû. Hevaleki wana, Vehbi ew çêkir.

Muzaffer Özgür, Nuh Ateş û hîn hevalên Vahit wana va em li Wetzlarê hatin ba hev, Vahit wana li wir çapxanê jî peyda kirin.

Mi cara yekê PCya xu ji bo vî karî, bi alîkariya Cahit Duran kirrî û dest bi nivisandina nivîsan kir. E ku hewûn û ê me ye amatör! Hînik resime di albuma me yê taybet da jî me kirin zik.

Hêjmara kovarê ya yekê li Wetzlarê li Elmanyayê, 1500 hew derket, di destî me da yek jî nema. Me him bi xû bi bawula bir Tirkîyê, him jî li komelê kurda, pirranî jî di Komkar an da ew belaw kirin, firotin.

Piranî jî di Newrozên ku Komkarê çêdikirin da me ew difirotin. Her yek ji me him nivîskar, him firoşkar, him hemmalê vî karî wû.

Kêm zêde me perê xu jî berhev kirin. Beyî va ruhî amatör me nedîkarî destpêbikin, bêyî bi vî ruhî jî ew kovar dûr û dirêj nedimeşiya. Le rokê ji ezmên da dengê ji me ra hat, ji bakurê Ewropayê!

Ali Ciftci, xadanê APECê, ji gundî Kelhesen. Wî telefona me

peyda kirû wû, kovar bihîstî wû, dixwast ji bo vê kar bike. Min yeka wî nekir dudu, hema ew dawetî civîna me ya li Wetzlarê kir. Ew hat Duisburgê, em bi hev ra tevhev çûn Wetzlarê. Bi hatina wî avayê civîna me hat gorrandinê. Me di civîna da bi pirranî tirkî deng dikir. Wî bala me kişand ser vê û got;

-Hevalno eger em bi rîya vê kovarê xizmeta ziman û kultura xu bikin, lazime em di civîna da bi kurdî deng kin!

Xelas...

Ji welêt wek piştgir û niviskarekî bêhempa, hêja Mem Xelikan (Dr. Mehmet Özsoy), ji Swedê Seyfî, disa kurdekî ji Bala Necatî Sezgin û hîn qasî 200 kesî heta nika di kovarê da nivîsandine. Resim û tehma çîrokên Bekir Dari hîn di bin zimanî min da ne.

Ew çi serbilindîyeke mezin î!

Îro kovar sedî sed bi kurdî derdikeve. Dewama çîroka min ji hêla hevalê din da jî ê wari qal kirin, nivîsandin.

Ez wêngê hîn nû zewicî wûm, hevala min, jina min, Şena Bilêl heta 6-7 hêjmara ew nivîsê ku ji me ra dihatin bi min va bi PC dinivisandin, zaro me di nav civîn û

hevdîtînên Birnebûnê da gir bûn.

Heta îro ji me giştika ew kar, bi serbixu çêkir û bi avakî lihev rêzgirtî meşandin.

Me bi her partî û hereketa kurdan va têkilî dayna, emma neketin tu bin bandora kes yan jî partîyekê. Di nav me da dostanî û biratîke pîrr rind, saxlêm ava bû.

Wekî din jî pîrr kes li pişt destpêka kovarê, tevli me bûn. Bi tevayi bira Xwadê ji giştika razî be

ku ew kara ji bo milletî xu kirin û hîn jî dikin.

Nika hendi înternet gîhişt hawara me, diwe ku dewleteka kurdî va royana di zikî dayikê da be û inşallah di demeke nederêj da wari ser dunê! Ew ê ji me ra, kurdê Anatolya Navîn ra biwe derman.

Ew hendû dora nişhê nû ne ku wê bi pêşva biwin, bi avakî îlmî û hîn bi serkevtîtir. Ez bi wê pîrr hêvîdar im.

25 îlonê

bimeşe

ne pêwîste ku paytext û paytext bigerî

ez î li pişt te me

mele mistefayî dengî mizgîniyê dipê

mîtrayî bi hezar çavan li benda azadiyê ye

di destî armaitî da destmala rengîn

xwe ji sergovendiyê re hazir dikê

çemên bihiştan li iştêha biharê ne

bimeşe

em ê li pişt te nî

ruhê bi me da were

xewn û xîyalên xwe bilê xweş e

bimeşe

li warên azad

eşqê

hîn xweş e

Seyfi Doğan

Bîtsaliya Bîrnebûnê pîroz be!

Kurdo (Fawaz Husên)

Ez di 1997an de, sala derketina «Bîrnebûnê», kovara hûnerî, çandî û lêkolînî ya Kurdên Anatoliyayê li Akallayê bûm cîran û hemsayeyê Alî Çiftçî. Gelek tiştan dihişt ku em bêhtirî du cîranan bin. Berî her tiştî, em herdu Kurd bûn, ew ji Serxetê, ji navçeya Qonyayê û ez ji Binxetê, ji Amûdê. Zimanê me yek bû, rabûn û rûniştinên me yek bûn û dilê me herduyan bi hezkirina Kurdistanê û pirtûkan lêdida. Keça wî ya mezin bi çend salan ji keça min mezintir bû û mala Alî fireh bû, herdem xwarin û vexarin lê pir bû. Em Kurd lê dicivyan. Zarokên me ji xwe li eywanê dilîstin û me jî li ser maseya mitbaxê, aşpêzخانهyê, me behsa xewn û xeyalên xwe dikir. Me dil û mejiyê xwe bi bayê bêrîkirina deşt û newal û çiyayên welêt dilorandin.

Weke hezar hezarên Kurdên din, Alî Çiftçî ji ber derbeya eskerî ya 1980an û Kenan Evren koçberî Ewropayê bûbû û li Swêdê, di nav berf û sermaya Skandînaviyayê de li qetek welat û pariyek

ewlehî û jiyan digeriya. Wî sê salan di kovarek kurdî de kar kiribû, perwerdebûn û pişeya mamostetiya zarokan xwendibû. Lê gava ew mamosteyê zimanê zikmakî bû, wî bi çavên xwe dîtibû ku pirtûkên keç û lawên Kurdan hema bêje ji binî ve nebûn û ji wê demê de wî biryar dabû ku bibe weşangêr.

Rojekê, wî reklamek di rojnameya «Dagens Nyheter» de dît: «Çapxaneyek piçûk bo firtotinê». Alî çû Spångayê, li cih û li mekîneyan nihêrî û pênc deqe di wê navê re neçûn ku wî biryara xwe da. Wî kontrat, grêbest, imze kir û gavek mezin ber bi xwevna xwe ve çû. Keça wî Evîn wê gavê şeş mehî bû. Alî tîp, herfa pêşîn ji navê xwe Alî, herfa pêşîn ji Pepîna, navê kebanîya xwe, herfa pêşîn ji navê keça xwe Evînê û herfa pêşîn ji navê malbata xwe Çiftçî li pey her rêz kirin û APEC hate dinyayê. Alî bû xwediyê çapxane û weşanxaneyekê, erê piçûk, lê weşanxaneya kurdî ya bi rastî yekem û herî mezin li Ewropayê.

Di sala 2000î de, min hevpeyvînek bi Alî re çêkir ku di kovara Karavan de belav bû. Min jê pirsî: Alî, gelo xwevna te ya herî mezin çi ye? Wî bersîv da û got: Xwevna min ew e ku rojekê ez herim weşanxaneyê û bibînim ku mezin û piçûkên Kurdan li ber derî rêz bûne û dixwazin pirtûkên kurdî bixwînin û hema bixwînin û tucarî ji xwendina wan têr nebin.

Ji roja ku APEC heye, weşanxaneyê li ser hev bêhtirî 400 kitêk çap kirine û ji wan jî piranî bi kurdî ne û bi her sê zarav û devok û dilakektan. APECê pirtûk bi swêdî, erebî û tirkî jî weşandine. Belê, belê, mirov xwevnan di serê xwe de çêdikin, tevnê wan dirêsin, da ku paşê wan bikin rastiyên rasteqîn. Alî jî, bêyî ku ji ber van serdemên bêyom hêvîşkestî bibe, hîna li pey xewn û peymana xwe ya berê ye û karê APECê didome.

Malabata Alî û yên gelek Kurdan di demên reş de ji Kurdistanê koç û bar kiribûn û li navçeya Qonyayê bi cih û war bûbûn. Alî dibêje ku Kurd li Anatoliyayê ji sedsala 11an û bi vir de bi cih bûne. Lêbelê li gor destûra « Mecbûrî Îskan »ê, di dawiya sedsala 18an de li wê navê behsa Kurdan dibe. Ya rastî, çûyîn

û hatina Kurdan ji welêt ji sedsala 11an ve ye heye, lê mixabin tu dokument û belgeyên fermî nînin ku Alî bikare tam vê tarîxê bide û bipeyitîne.

Belê, ez wê gavê li Alî matmayî mam çûnku eger Kurdên Kurdistanê zimanê xwe bi hêsanî gelek caran di ser guhên xwe re diavêtin, hemû rabûn û rûniştinên Aliyê ji Qonyayê, û yên birayên wî yên li Ewropayê, xwerû kurdî bûn. Hezkirina Alî ji zimanê û ji dîroka xwe re ewçend xurt bû ku wî biryar da ku kovara «Bîrnebûnê» derêxîne. Wî bi vê yekê xwest çand û dîroka Kurdên Anatoliyayê ji windabûnê xelas bike û biparêze. Min di vê kovarê de beşek ji gotara Georges Perrot, gotara bi navê «*Les Kurdes de L'haymanah*», (Kovara Revue des Deux Mondes, rûpelên 607-631, sala 1866an) wergerand û di « Bîrnebûn »ê de weşand. Paşê, sala 2000î, min hemû nivîs bi pêşgotin, wêne, têbînî û şirove li weşanxaneya APECê belav kir.

Alî Çiftçi stûnek ji stûnên çapemeniya kurdî ye. Ez dizanim ku ew dikare çakêta xwe jî bifiroşe da ku hejmarên « Bîrnebûn »ê tucarî ranewestin û APEC jî her hebe û karê xwe bidomîne. Min beriya du

sê mehan ew li Parîsê dît. Alî ew cîran û ew bira û ew dostê demên Akalla û Spangayê bû. Tiştek jê nehatibû guhertin, lê 20 sal di wê navê re buhurîbûn. Min ew li Parîsê gerand û li meydana Concordê, li wê dera bêhempa dîrokî, wê dera ku Fransiyayê serê qiralê xwe, Louisê 16an û yê Marie-Antoinette, jê kiribûn, wî ji min re behsa bîstsalîya «Bîrnebûn»ê kir. Min dixwest dostê xwe bêhtir li Parîsê bigeranda, lê balefera wî di heman rojê de bû. Alî

dizîvirî Swêdê, APECê, Bîrnebûnê, malbata xwe û hemû kar û barên xwe yê weşangêrekî kurd.

Min jî nexwest ji bo vê pîrozbahiyê, vê 20salîya «Bîrnebûn»ê nivîsek akademîk û bi rêk û pêk binivîsim. Na, min tenê rê da hest û hîsên xwe. Min xwest ji «Bîrnebûn»ê û ji cîranê xwe yê Akallayê, yê berî 20 salan, re dibêjim: Her bijîn û mala we hemû nivîskar, kedkar û redaksiyona Bîrnebûnê hezar carî ava!

Kovara Bîrnebûn dengê Anatoliya Navîn

Rohat Alakom

Dema kovara *Bîrnebûn* di sala 1997an de derket wek bûyereke çandî gelek bala xwendevanan û kurdan bi giştî kişand. Derketina kovarê bû sedemê kelecana û coşeke mezin di nav şênîyê Kurdên Anatoliya Navîn de. Bi saya vê weşanê şênîyê herêmê bû xweyê dengê, hêz û çavkaniyeke çandî.

Bîrnebûnê bi hejmara xwe ya 9/2000 sedsala 20an gîhande sedsala 21an. Eva bîst sal in kovar her derdikeve. Di nav demeke kin de hejmara jimarên ku heta niha derketî dighêje 70yî. Eger mirov deh jimarên bike cildekî wê demê 7 cildên kovarê pirtûkxaneya her

kurdekî baş dikare bixemilîne. Bi derketina her hejmarê di nav van bîst salan de cîhê nivîsên tirkî her çûye teng bûye. Îro kovar eger derqayde tunebin bi temamî kurdî derdikeve. Kovar ketiye rêyeke rast! Bi dehan nivîskar, helbestvan, lêkoler û hunermend bi keda xwe ya mezin alîkariyê kirine. Bîst salîya kovarê û hemû kedkarên wê bi dil û can pîroz dikim. Bîrnebûnê herwiha di pêştabirina zimanê vê herêmê de bi rastî roleke mezin lîstiyê/dilîze. Di derxistina kovarê de divê navê Weşanxaneya APEC û xweyê wê Eliyê Cotkar jî neyê ji bîr kirin.

Bîrnebûn û KAN

Mem Xelîkan

Demeke dûvdirêj e Kurdên Anatoliya Navîn (KAN), li heremê bi cih û war in. Di wê demê de, di jîyana xwe de, gelek nirx (çand, huner, gelnasî) afirandine. Hetanî bîst salan berê, kesekî dest neavitibû, çand, huner bi kurtasî jîyana wan. Hetanî wê demê, tu sazîyên KAN tunebûn. Ji bo vê yekê, destpêka weşandina Bîrnebûnê ji bo KAN dîrok e.

Bi weşandina Bîrnebûnê, hevalan di jîyana KANê de valahîyek mezin tijî kirin. Dest avitibûn dîrok, ziman, çand, huner û gelnasîya KANê ku li ber devê wendabûyîne bû. Û hetanî wê rojê nehatibû nivîsandin. Hevalên li derdora Bîrnebûnê civîyan, bi kelecânî û hewldaneke mezin dest bi kar kirin. Heval, fikir û dîtina min parva bikin an nekin nizanîm, ew hevalan bi pirranî amator bûn. Ji xeyrî çend kesan, bi kurdî xwandin û nivîsandina me di nav pir hevalan bi kêmasî bû. Bîrnebûn, him ji xwendekaran re him jî, ji nivîskarên xwe re bû dibistanekê. Pir xwen-

dekar û aboneyên Bîrnebûnê, ji bo ku Bîrnebûnê bixwînin, bi kurdî xwandin û nivîsandinê hîn bûn û ew pêsta birin. Nivîskarên Bîrnebûnê jî, ji bo ku nivîsên xwe bê xelatî binivîsînin, kêmasîyên xwe yê ji bo zimên kêma an jî tune bikin, hewldaneke mezin dan. Ji bo wê jî, her roj derbas bû hejmara xwendekar û nivîskaran zêde bû.

Bîrnebûnê, ji bo dîroka KAN, ji bo gelnasî, çand, huner û ziman, bi kurtasî jîyana wan gelek lêkolîn, heypeyvîn çêkirin. Gotinên mezinan, wêje, kilam û stran, yarenî û henekên KAN berhev kirin, weşandin, bi nivîskî ew arşîv kirin û ji tunebûnê xilas kirin. Bi weşana Bîrnebûnê re, Hekat, çîrok û helbesta KAN jî biderkete holê. Berhemên hevalên ew nivîsandî, di hejmarên xwe de weşandin û ew hevalan motîve kirin û her çû hejmara kesên helbest, hekat hwd. dinivîsin zêde bûn. Û bi wî karî jî, Bîrnebûn, ji me re him bû dibistan him jî bû ansîklopedîyeke KAN.

Bîrnebûn, îsal kete bîst salîya

xwe. Emrê wê hê dirêj be. Ewkas sal emir, nebûye nesîbê her kovar û weşanekê. Bi dîtina min sedema wê, hevalên ji bo weşandina Bîrnebûnê, bîryar girtî û hatine cem hev, heryek ji organîzasyonê kurdan, organîzasyonên berî 12ê ÎLONê yên ji hevdu cûda hatibûn. Kesekî ji wanan, tu caran fikir û ramanên xwe yên politîkî û sîyasî bi dere pêş nexistin. Di çarçeweya kovarê de, kovara; hunerî çandî û lêkolînîyê de karê xwe meşandin. Baş jî kirin, ji bo wê emrê kovarê vîkas dirêj bû.

Pêşerojê, ji bo ku em xwe dubare nekin, dixwaze Bîrnebûn, bi projeyên nû biderkeve hemberî xwendevanan. Wek belge film, ji bo dîroka KAN pirtûkek, weqfa li Swêdê actîve kirin hwd. heval serê xwe li ser wê biêşînin ya baş bibe. Xwendevan jî, dixwaze ji bo pêşerojê kovareke çawa dixwazine û naveroka wê çawa be fikir û ramanên xwe ji Bîrnebûnê re binîvsînin.

Bîst salîya Bîrnebûnê pîroz dikim. Ji hevalan re serketinê dixwazim

Bîstsaliya kovara Bîrnebûnê

Bîstsaliya kovara Bîrnebûnê pîroz dikim.

Bîrnebûnê heta îro xizmeteka mezin kir.

Îro jî barê Bîrnebûnê pir giran e.

Daxwaza min em hemû alikariya Bîrnebûnê bikin.

Ji we re serkeftinê dixwazim.

Hüseyin Kerpiç

Ew hîssîyatê ku Bîrnebûnê di dilî me da pêyde kirî, ti car ji bîrnebû.

Reben Celikan

**Gava min cara pêşî hejmare-
ke kovara Bîrnebûnê kir dest
xwe û xwend, hîn wekî îro di
bîra min da ye.**

**Têye bîra min, ew nivîsarên
têda, wêneyê li ser bergê çî
hîs û raman di dil û mejoyê
min da derxistin holê, çawa
kelecanê bi laşê min girt...**

Li wê demê, me jî didît hewcedariya kurdên Anatolyayê bi tiştêkî ûsa hebû ku hinek ji wan ra pêşengiyê bikin. Komek, sazîyek yan şaxsîyetek biderketa û xelkê me li dora xwe bicivanda, çand û hunerê wanan berhev bikira û ya herî giringtir jî, ji bo parastina hebûna xwe, rêyek bida pêşiyê wanan. Anuha jî hinek kesên alîyê me, bi kovareke tijî agahî, tijî hevî biderketîbûn pêşiya me, bûbûn namzet ku rolekî mezin di dîroka kurdên Anatolyayê da bileyzîn.

Di hejmarên destpêkê yê kovara Bîrnebûnê da ew ruh, ew şewqê ku bawerîyek di dilî me da pêyde

dikirî hebû. Me bawer dikir kurdên Anatolyayê wê bi pêşengîya kovara Bîrnebûnê xwe bi pêş bixînin. Lê çawa bû, kengî çêbû, piştî kîjan hejmarê kovarê bû, nizanim, Bîrnebûnê ew dînamîzma di nava xwe da wenda kir. Ne ji nişka va, lê hêdî-hêdî biderket holê ku kovara Bîrnebûnê bi tenîya xwe nikarîbû kurdên Anatolyayê ku li hember çerxê asîmîlasyonê ku her diçe bileztir digere, biparêze. Gerek bû ku, agirî bi destî Bîrnebûnê hatî vexistin bi rêbazên din yên wekî rêxistin, sazî, radyo yan TV bihata şênkirin. Lê pêşketinek çênebû. Bîrnebûn wekî xwe ya destpêkê ma û her ku derbas bû naveroka kovarê siviktir bû.

Kovar weşanê xwe hîn jî berdewam dike, lê wekî hespekî ku siwarê xwe ji ser ketî be, bê ku bizane bi ku da here, bê bar dibeze

Na, ew hîssîyatê ku Bîrnebûnê di dilî me da pêyde kirî, ti car ji BÎRNEBÛ.

Bîtsaliya Bîrnebûnê

Nuh Ateş
nuhates@web.de

Ferd, kom û millet bi nasnameyên xwe tên naskirin û ji hev tên derxistin. Nasname gotineke piralî û pîr-rengî ye. Meriv dikane çandûzimên, cîûwar û dîrokê mîna sê sitûnên nasnameyê ên bîngêhî bi nav bike. Meriv bê nasname nabe û naxwaze ku nasnameya wî bihê bînpê û bend-kirin. Milete kurd ji esîrekê zêdetir e li ber xwe dide sewa ku nasnameya wî ya netewî û mafê wî ê çarenûsî bê qebûlkirin. Di vê berxwedana dîrû-dirêj da, derxistina rojname û kovaran jî rolekî giring lîztîye û dilîze.

Navê rojnameya kurdî ya pêşîn Kurdistan bû. Ew bi serkêşîya Mîdhat Bedirxan, ji avûrûyê astengiyên rejîma Abdulhamid, 22ê nîsana sala 1898an li dervayî welat, li Kahîrê hate derxistin. Mîdhat Bedirxan derheqa armanca wê da gotiye; “Ez vê rojnameyê sewa hayîdar-kirina kurdan derheqa bûyerên li dinyayê, nimandina rêyên zanistî û huneriyê û teşwîqkirina xwandin û nivîsandina kurdî derdixim!” Ji şeş hejmaran şûnda, rojnameya Kurdistan ji ber destdirêjî û astengiyên li welatên Awropayê hate derxistin.

Mîna ku bibêjî qeder e, paşê jî pîr rojname û kovarên kurdî li dervayî welat hatin derxistin. Nezika 120 salan ji derxistina rojnameya Kurdistan şûnda kovara Bîrnebûn jî hemahema bi eyni armanca li dervayî welat, li Awropayê derket. Meriv dikare Bîrnebûnê mîna nişan û encama lêgerîna kurdên Anatoliyê ya li nasnameya xwe a kurdî û ciwarî bihesibîne. Wekî li ser rûberê wê yê pêşî hatiye nivîsîn, Bîrnebûn kovareke hunerî, çandî û lêkolînî ye. Ew di dîroka kurdên Anatoliyê da kovara pêşî ye. Bîrnebûn bi wêrekî, fedekarî û hevkarîya komek ronakbîrên kurd yê Anatoliyê di sala 1997an da dest pê wêşanê kir û bîst sal in ku derdikevê. Ev koma bi pîranî, îro jî li pişt Bîrnebûnê ye. Helbet hen kesên din jî li wê komê zêde bûn.

Her çi qas ku di sêrî da, kovar kurdî û tirkî, duzimanî bû jî, di hejmarên pêşiyê da giranî li ser nivîsên bi tirkî bû. Heta pêşgotina hejmara yekan jî tenê bi tirkî bû. Lê paşê, pêdapêda cihê nivîsên bi kurdî fe-rehtir bû û dem hat giranî vegeyîya

ser kurdî (pirtir bi kurmançî, carcaran jî bi zazakî û şêxbizinî). Gava meriv çavlebigerîne, heta niha di kovarê da nivîsên bi sedan kesî bi kurdî hatina weşandin. Kurtebîrî, meriv dikane bibijê, Bîrnebûnê di nav kurdên Anatoliyê da rê li ber xwandin û nivîsandina kurdî vekir. Di salvegera bîstemîn da êdî Bîrnebûn bitûn bi kurdî derdikeve. Di lêgerîn û berxwedanên azadî û serweriyê da pir cephe hene. Kovara Bîrnebûn bîst sal in ku di cepheyê ziman û kulturî da cih digrê û li hember wêrankariya kultura kurdî li Anatoliyayê li ber xwe dide.

Ji bo xwenasîna kurdên Anatoliyê û danasandina wan bi reya gîştî Bîrnebûnê rolekî sereke list û dilîze. Bi sedan berhemên folklorî; çêrok, gotinên mezinan, kilam, lîstik, yarênî û yd hatin berehevkerin û weşandin. Bi dehan lêkolîn, meqe, belge, wenê li ser tarîx, cografya, cih û warên kurdên Anatoliyê, taybetiyên wan yên civakî, kulturî û zimanî, êşîrên wê herêmê, koçberiya wan ya berve Anatoliyê û li wir biçihkirina wan ya bi zorê fermanên padîşahên osmanî, sîyaseta înkariya nasnameya kurdî û asîmilasyonê di Bîrnebûnê da hatin weşandin û

belavkirin. Ji xeynî van, bi dehan hevpeyvîn, werger û berhemên edebî yên nûjen, wekî helbest, Heqat, kurteçêrok, serpêhatî û bîranîn bipirani jî qelemên kurdên Anatoliyê bi rêya Bîrnebûnê gihêştin û digihên xwendevan û hezkeran. Şayanî gotinê ye ku ji van kar û xebatên bi salan arşiveke mezin û giranbiha hate pê. Bi dehan kombûn û konferens bi mijarên li ser kurdên Anatoliyayê bi destê Bîrnebûnê li welêt û li welatên Awropayê hatin çêkirin.

Di vê xebata bîst salan da keda bi sedan kesan heye; nivîskar, xwendevan, piştevan... Lê bi ya min, keda hen kesan di ser yên din ra ye. Ji ber ku xeyrî karê nivîsandinê jî keda wan heye. Sewa vê, dixwazim li vir navên wan heldim: Elî Çiftçi (karê nizam-pajê, serastkirinê), Seyfî Doğan (karê redaksîyonê) Mecît Çiftçi (karê çapkirinê), Muzafer Özgür (karê belavkirinê, pewendiyên bi derva û aboneyan va), Îhsan Türkmen (karê malperê û Internetê).

Hun her hebin, sewa keda we ya giranbiha hezar carî spas ji we ra!

Ez şa dibim û serbilind im ku bîst sal in hevkar û kedkarê BÎRNEBÛNÊ me!

13.06.2017, Mainz-Almanya

Bîrnebûn û xalê min Mizaffer

Adem Özgür
ozguradem25@gmail.com

Min di zarokatiya xwe de Bîrnebûn naskiribû. Di saya xalê min Mizaffer (Özgür) de kovar kete mala me û her wiha di jiyana min de şûn girt. Pîrika min, etkê min û xaltika min pir caran qala kovarê dikirin. Digotin Mizaffer di vir de dinivîsê û qala çîrok û meseleyên gund dikê. Ev gotinên mezinên min, ev tiştên ku xalê min dinivîsî her tim bala min dikşand. Min mêla xwe dide kovarê, pir caran xwe zor dikir û kovar dixwend, li resman mêzedikir û kêfa min jê re dihat.

Xalê min nivîsek li ser serpihatiya xwe ya Mereşê nivîsî bû, di destpêka nivîsî de qala dengkirinên kalê min Bekirê Mala Hesenko, Miçkî Çewîş, Ehmedê Mala Rawê Emzê dikir. Wextê min nivîs dixwand ez ber bi wan rona diçûm û min xwe di wê sohbetê de didît. Navên di nivîsî de, çîroka hatî zimên, çûyîna Mereşê pirr bala min kişandibû, min xwe bi xwe digot “Ez jî rokê herim wê derê û tiştên ku hatin serê min ji Bîrnebûnê re

binivîsim.” Û min nivîsî jî! Ew rok va rokaye Bîrnebûn qet ji dest min neket.

Rokê xalê min ji min re peyamek şand û got: “Xarzi, ez dibînim ku tu her tim bi tirkî dinivîsî. Tengê dev ji tirkî berde, mêla xwe bi kurdî de, bi kurdî binivîse.” Min ji xalê xwe re gotibû, ez nizanim bi kurdî binivîsim û ditirsim jî: “Lêk ez xwe şaş bikim?” Xalê min ji min çend mînakên bi kurdî xwestin û min jê re nivîsand. Wê ji wan mînakan hezkir, lê ez disa jî ditirsîm û min fedî dikir: “Lêk ez xwe şaş bikim?”

Min şaş û baş pirr caran ji xalê xwe Mizaffer re nivîs dişandin, wê şaşiyên min rast dikir û disa ji min re dişand. Ji çend çîrok û mînakan bi şunda xalê min ji bo Bîrnebûnê ji min nivîsek xwest. Hingê kelençanek kete nav dilê min, ez pirr pê şabûm û li hêlkê jî ez ditirsîm. Min dest bi nivîsek kiribû, nivîsa min a yekemîn li ser kurdî bû, ev nivîsa di kovarê de hate weşanin.

Ew rok va roka ye ez car caran
ji kovarê re dinivîsim û ketim nava
nivîskarên Bîrnebûnê...

Di rojnamegerîyê de têgehek heye,
em jê re diwên di nûçeyê de nêzik
bûn. kî/kê çi nêzikê xwe dibîne, kî/
kê ji ku derê, ji çi hezdike, kî/kê
bala xwe dide çi; wan nûçeyan zê-
detir dixwîne û dişopîne. Ji bo min
jî Bîrnebûnê weng e. Çîroka min,
dîroka min, şîn û kenên min, çand
û hunera min di vir de ye. Wextê
ku kovarê vedikim û dest bi xwen-
dinê dikim di her hejmarê de xwe,
dî û bavê xwe, pîrên xwe; heval û

cîranên xwe; der û dorê xwe; gund
û bajarên xwe têde dibînim.

Kovar îro 20 salî ye. 20 sal in ku
di jiyana min de ye. Min di saya
kovarê de teza xwe ya zanîngahê
amadekir, ez di saya kovarê de pîrr
tiştan hîn bûm, min bi dehan nûçe
di saya kovarê de nivîsîn, wextê ku
lêkolînek dikim, cara siftê dikevim
arşîva kovarê û li belgeyan dinêrim.
Ji ber her tiştî min di saya kovarê
de kurdî evsî.

Bîrnebûn dengê me ye. Divê lê
xwedê derkevin.

Bîstsaliya kovarê pîroz be!

Pîrozbahîya bîstsaliya

kovara *Bîrnebûnê* li Stockholmê
di 7ê payîza navîn(oktober)
li Restauranga **Parabolenê**,
Rudsjöterrassen 2, Haninge çêdibe.

Bi xêr bên!

Çend gotin ji bo Bîrnebûnê

Muzaffer Özgür

Di jiyana min de cara yekemîn eleqaya min ya rojnamegerîyê di dema ez li Kuluyê diçûm lîseyê de çebû. Dema ez diçûm sinîfa yekemîn, cîran û doştekî min hebû. Ew fotografvan bû. Di dûkana xwe ya fotografîyê de ji dervayî fotografîyê li qeza me rojnameyêka hefteyî derdixişt. Rojnameya „Kîraç“.

Kiraç, reş û spî û bi heyşt rûpelan bû. Navê xwe ji deşta Anatolîya Navîn girtibû. Di naverokê da jî nivîs, xeber û reklam hebûn. Min ji bo amadekarîya rojnameya *Kiraçê* carcaran alîkarîya cîranê xwe dikir. Me nivîs herf bi herf didan ser qaliba û ji çapê re amade dikir. Di odeya tarîda resm amade dikirin. Kefa min ji wan karan pir dihat.

Sal derbas bûn... rojekê li Kuluyê ez li cem hevalan bûm. Hat gotin ku kurdê kovarekê derxine û ji bo berpirsiyarîya kovarê kesek gerez e. Min xwe avet pêş, daxwaz kir ku kar bigirim ser milên xwe. Lê li dawîyê ji ber rewşa malbatîya min hevalan qebûl nekirin. *Özgür*

Gelecek derket. Me piştgirî dayê.

Paşê min di nav karûbarê kovara *Vatan Güneşîyê* de cih girt. Sal derbas bûn *Medya Güneşi, Roj, Nûroj* li dawîyê bûn karê me. Ji nivîs û xeber amadekarîyê heta karê çapê me kir. Me di nav toza kaxiza da û li ber şeka-teka çapxanê de gelek tecrûbe girt in.

Rexistina ez teda bûm, bi biryareka navendî; li ser kurdên li Tûrkiye dijîn kar da ber xwe. Em ketin nav karûbarê kurdên Anatolîya Navîn. Meriv dikane gelek tiştan binivîsîne. Me li Ankara, Konya, Cihanbeyli û Kuluyê civîn çêkirin. Rojekê di civîneka li Kuluyê de hevalekî dûkandar got;

-Şora pir mekin, em sîftê bûltenekê derxin û li navçeya me belav bikin. Li piştra jî em kovarekê derxin.

Ew gotin gelek bi kef bû. Me bi amadekarîyên xwe berdavam kirin û hevalên rêxistinê agahdar kirin. Ew li pişt me bûn. Gotin;

Hûn li AN. Otonom in dikarin biryarên xwe bixwe bigirin

û karê xwe bidisîplîna rexistinê bimeşînin.

Roj hat ez mecbûr mam ji welat derkevim. Di sala 1995an de hatim Almaniyayê. Me li vir jî karê xwe berdevam kir. Min gelek heval naskirin. Hacî Erdogan jî kurdên çolê bû û di rojnameyên kurdan de dinivîsî. Me daxwaz kir em ji bo KAN kovarekê derxin. Rexistin û komela me ya navendî daxwazên me kabûl kirin. Kek Hecî gelek bi kelecana bû. Wek mîna niha rewşa me ya aborî jî ne baş bû. Kek Hecî pere dên kirin û çû Sembûlê heval dîtî û paşê beriyê xwe da deşta Anatoliya Navîn. Li çend bajar û bajaroka heval û dost ziyaret kirin û proja dilê xwe eşkere kir. Bi rexistinên kurda re tekilî dînan. Tê bîra min serokekî rûspî ji kek Hecî re gotibû;

Hûn di nav kurda de dubendiyê dikin. Heremparastiyê dikin şaş e û ne rast e.

Dema di *Özgür Politikayê* da îlanêk belav kir, navê kovara ku derkeve kiribû Bîrnebûn. Êdî gav paşta avetin tûnebû. Min digot;

Ecele mekin, hîn zûyê.

Lê li ber bayê amadekarîya jî nedikanî bisekinim. Hazirî hatin kirin ku li ser navê şirketa

Medkomê (Îstanbul) kovarek be derxistin.

Em li Avrûpa ketin nav teki-liyan, çend hevalan gelek însanên ji AN. ziyaret kirin. Hat fahm kirin ku ji dervayî lêgerîna me, çend hevalên din jî ji aliyekî din de li ber xwe dane û civînek çêkirine ku, karekî li ser KAN bikin. Mala hemûyan ava be. Me hevûdu naskir û li dawîya çend civîna bi şûnda biryara derxistina kovara Bîrnebûnê da.

Kovar li welat li ser navê şirketa rojnameya Rojê biderketa. Lê ji ber pirsên huqûqî û teknîkî nebû. Me biryar da li dawiyê me karê xwe xelas kir û li Almaniyayê dest bi weşanê kir. 21.3.1997 li Newroza Kolnê ya komela Komkarê me standa xwe vekir û dest bi belavkirina kovarê kir. Bi sedan kes dihatin kovar dikirin û em pîroz dikirin. Kelecaneke mezin ket nav KAN. Lê mixabîn çend rexistinên me karê me biçûk dîtî. Qerfê xwe bi me dikirin.

Mala hevala ava be ku bê pirs berdewam kirin. Her hevalekî li gor quveta xwe piştgirî da. Çend heval ji ber jîyana xwe ya taybet ji me bidûr ketin. Wan jî fedakarîyên mezin kirin. Ew hîn

jî di dilê me de dijîn. Apecê jiyana kovara me dirêj kir. Piraniya me bûn niviskar.

Bi xeyalên kek Hacî Erdoğan bilêz be jî gav hat avêtin. Bi tecrûbeyên kek Mehmet Bayrak û Nuh Ateş û bi fedekarîya hevalên wek; Fikret, Beko, Vahit, Cahit, Hüseyin, Nurşen, Mem Xelîkan, Seyfî, Yusuf, Mistefa, Şexo, Ihsan, Ecevit, Özgür, Faik, Dr. Hatice, Eşgozel, Yasemîn, Suna, Sultan, kek Mecît, Ali Çiftçi û Cüneyt, Vehbi, İrfan, Neçîrvan, Lütfü, Hamît bi piştgiriya Kome-la Ziman ya li Almaniyayê û Vakfa Kurdên Anatoliya Navîn ya li Stokholmê û 200î zede niviskarên

me, ji bo firotina kovara me li Tûrkiyê, û li Avrupa dost û hevalan 20 sal li paş me man.

Em bi malbat di nav kar da man. Zarokên me di nav hejmarên kovara me de mezin bûn. Em bûn malbateka mezin.

Xeyala min a niha ji bo KAN televîzyoneka kurdî li Anatoliya Navîn e. Bi rastî zehmet e? Ma destpêka Bîrnebûnê jî ne bi zehmet bû! Roj roja li hev xûdan derketinê ye. Heval, dost, reçber, şivan, xwandevan, karker, mamoste, doxtor û dewlemendên me û yên din. Bi zehmet e!

Na xêr, gerek gav bê avêtin. Li ser xêrê be!...

Li ser bîtsaliya Bîrnebûnê

Memê Mala Hine

Di dîroka çapemeniya kurdî de kêm rojname an jî kovar hene ku emrê wan ji 20 salan zêdetir bin. Belê îsal kovara Bîrnebûnê bîtsaliya xwe temam dike. Yekemîn kovara kurdên Anatolyayê Bîrnebûn digel ku yekemîn e jî karî bîst salan weşana xwe bidomîne û ber bi çaryek sedsaliya xwe ve biçe. Ji hin aliyên ve kovara Bîrnebûnê ji bo kurdên Anatolyayê dişibe rojnameya Kurdistanê. Yekemîn rojnameya kurdan rojnameya Kurdistanê di sala 1898an de li derveyê welêt, ango li Qahireyê hate derxistin. Kovara Bîrnebûnê jî sed sal piştî rojnameya Kurdistanê li derveyê welêt hatibû derxistin. Hejmarên rojnameya Kurdistan û kovara Bîrnebûnê ji derve li welêt dihatin şandin û belavkirin. Bi vî awayî kovar digihîştin destê xwendewarên xwe yên nav welêt.

Gelo kovara Bîrnebûnê roleke çawa list? Ji bo bersiva vê pirsê divê em bala xwe bidin salên beriya derketina kovara Bîrnebûnê. Nifûsa ew kurdên ku sedan sal berê koç kiribûn Anatolyayê û li sedan gundan bi cih bibûn gihîştibû sedan hezar kesî. Ew kurd li gelek deverên

cihê yên Anatolyayê bi cih bûbûn. Herçiqas kurdên Anatolyayê kêm zêde derheqê xwe de xwedî hin agahî bin jî wan bi awayekî hûrbîn nedizanî ka ew kengê, ji ku û çawa hatine, hejmara wan çiqas e û her wekî din... Her wiha ji bo lêkolîner, dîrokzan û civaknasan heyîna kurdan a li Anatolyayê wekî heyulayekê bû. Tenê dihat zanîn ku hin kurd li hin deverên Anatolyayê hene. Lêbelê nedihat zanîn ka ev kurd kengê, çima, çawa hatine, ji kîjan eşîr in, çawa dijîn, çand û zimanê wan çawa ye û hwd. Beriya ku kovara Bîrnebûnê were derxistin rewş wiha bû. Di salên 1990'î de çend berhemên ku zanyariyên bisînor derheqê wan kurdan de dida, hatibû çapkirin. Van berheman pirsên derheqê kurdên Anatolyayê de zêdetir kirin. Di mercên wiha de komek rewşenbîrên ji kurdên Anatolyayê li Ewropayê hatin ba hev û di sala 1997an de dest bi derxistina kovara Bîrnebûnê kirin.

Her hejmareke Bîrnebûnê derheqê kurdên Anatolyayê de zanyariyên gelek giring ên ku nedihatîn zanîn derxistin holê. Bi her hejmareke vê kovarê entelektuel,

rewşenbîr û nivîskarên kurd ji hev agahdar bûn. Kovara Bîrnebûnê dehan qelem gîhandin. Dehan nivîskar hene ku bi saya Bîrnebûnê dest bi nivîsandinê kirin û wan kilam û metelok û çîrokên kurdên Anatolyayê ji mirinê xilas kirin. Her hejmareke vê kovarê ji lêkolîner û nivîskarên ku dixwazin li ser kurdên Anatolyayê bixebitin bû çavkaniyek. Sal bi sal nivîskarên Bîrnebûnê nîşan dan ku edebiyata devkî ya kurdan deryayek e û li benda lêkolîner û berhevkaran e. Gelek nivîskarên Bîrnebûnê derheqê wan devok û diyalektên kurdî yên ku di nav kurdên Anatolyayê de tên qîsekirin de zanyariyên girîng ragîhandin. Ji formên cihêreng ên kurmançî bigire heta yên zazakî û şêxbizînişê eşkere bû ku di nav kurdên Anatolyayê de kurdî zindî ye û ji bo lêkolînerên zimanê kurdî gelek daneyên bikêr û balkêş hene. Ev dane ne tenê li ser kurdên Anatolyayê, lêbelê li ser kurdên li Kurdistanê jî zanyariyan dide.

Bi saya Bîrnebûnê dewlemendiyaya muzîka kurdî ya di nav kurdên Anatolyayê de derket holê. Gelek hunermendên kurdên Anatolyayê bi saya Bîrnebûnê bi dewlemendiyaya muzîka kurdî hesiyar, kilamên ku bi jibîrkirinê re rû bi rû mane ber-

hev kirin û di berhemên xwe de ev kilam ji nû ve gotin. Mirov rojane van kilaman dikare li kolanan, li dawetan bibihîse, li albûmfiroşan van berheman peyda bike. Kilamên kurdên Anatolyayê êdî tenê bala hunermendên vê deverê nakşîne, her wiha gelek hunermendên kurdên ji Kurdistanê berê xwe didin van kilaman û melodyaya van kilaman êdî jî hêla guhdarên muzîka kurdî ve tê zanîn.

Wekî ku me di destpêkê de jî got, kovara Bîrnebûnê ji gelek aliyayan ve dişibe rojnameya Kurdistanê. Herdu berhem li derveyî welêt tên çapkirin. Rojnameya Kurdistanê bi gelek zehmetiyar ji Kurdistanê re dihat şandin. Bêguman ev yek ji bo Bîrnebûnê hinek cihê ye. Lewre ev kovar bi awayekî fermî bi rêya postê tê şandin. Ji bilî vê jî, her kes dikare bi rêya înternetê hemû hejmarên vê kovarê daxê. Ev yek jî derfeteke mezin dide xwênerên kovarê. Li her cihekî dinyayê mirov dikare bi hêsanî kovarê bi dest bixê û bixwîne.

Kovara Bîrnebûnê kariye di navbera rewşenbîr û entelektuelên kurdên Anatolyayê de torek ava bike. Ev tor hevkarîyek di navbera van kesan de pêk aniye. Ji ber vê torê him li Ewropayê him jî li Anatolyayê

bizavek pêk hatiye. Encamên vê hevkarîyê herçiqas li Ewropayê bêtir li ber çavan be jî hêdî hêdî li Anatolyayê jî tê dîtîn.

Mirov dikare rola ku kovara Bîrnebûnê lîstiyê bi dûr û dirêjî vebêje. Lêbelê armanca vê nivîsê tenê ev nîne. Divê mirov behsa hin kêmasî û pêşniyaran bike. Berî her tiştî divê mirov behsa nebûna Bîrnebûnê di pirtûkfiroşên li Anatolyayê bike. Belê niha Bîrnebûn li Stenbolê tê firotin, lêbelê li Enqere, Kîrşehîr an jî Konyayê kovar nayê firotin. Bi dîtina min divê ev yek wekî pîrsgirêkek were dîtîn û çareserkirin.

Bîrnebûn herçiqas di destpêkê de qelemên nû gîhandibin jî di salên dawîn de êdî nivîskarên nû zêde nayê dîtîn. Bêguman dewamkirina nivîsên nivîskarên berê yên Bîrnebûnê tişteki baş e. Lêbelê li gel wan nivîskarên kevn, divê nivîskarên nû jî cihê xwe bigirin û berhemên xwe di kovarê de belav bikin. Kovar divê bala ciwanan bikşîne û ciwanan teşwîq bike da ku bi zimanê xwe û li ser kurdên Anatolyayê berheman biafirînin. Bi taybetî jî xwendekarên mastir û doktorayê ji bo ku li ser kurdên Anatolyayê bixebitin, divê werin teşwîqkirin û berhemên wan jî divê di Bîrnebûnê de werin belavkirin. Bi taybetî jî xwendekarên

dîrokê dikarin di arşîva Osmaniyan de li ser kurdên Anatolyayê belgenamayan berhev bikin, wergerînin û çap bikin. Lewre di vî warî de kêmasiyeke mezin heye. Piştî ewqas salan hîn jî li ser egera hatina kurdên Anatolyayê û peywendiya kurdên Anatolyayê û dewleta Osmaniyan de nediyarî hene.

Niha li başûrê Kurdistanê di zanîngehan de gelek xebat li ser deverên cihê cihê yên Kurdistanê û kurdên ku li derveyî Kurdistanê dijîn tên kirin. Divê kovara Bîrnebûnê hewl bide ku di van zanîngehan de li ser kurdên Anatolyayê xebatên akademîk werin kirin û her wisa xwendekarên ji kurdên Anatolyayê re derfet çêbike da ku li başûrê Kurdistanê bixwînin û xebatên akademîk li ser kurdên Anatolyayê bikin.

Xwezî Bîrnebûn bîstsalîya xwe li welêt, di nav kurdên Anatolyayê de pîroz bikira. Lêbelê ji ber şert û mercên heyî ev xweziya me pêk nehat. Lêbelê hevî dikim di bîst û pênc salîya Bîrnebûnê de şahîyeke wiha were lidarxistin û Bîrnebûn armancên xwe yên damezrandinê bi berdewamî bi cih bîne. Lewre hewcedariya kurdên Anatolyayê bi vê yekê gelek heye.

Şeva tarî

Seyfî Doğan

Şevê. Tarîyê. Tarîyê ke ku insanan kor dike. Bêdengiyêke ku insanan ker dike û diceribînê hebû. Hestirk li ezmên dişewitîn..

Ez, li xanîyêkî nezîkî nevalê pîreke li ser sokanê runiştî bûm. Nevalê pîrikê, çavkanîya cin,perî û neysizayê. Li wê şavê tarî û ker, min dinê temaşe dikir. Bi xeyalan û xefnên xwe, ezî li cîh runişkandi, li her derê geriyam.

Erebe Mitra hate bîrya min. Erebe berî xwe yî berve rojê bû. Deh hezar çavên wî dînê temasha dikirin û mergên ga û kerîyên pêz diparastin. Riskî zîndîya bi berf û baranê zengîn dikir.

Anahîta li kevîya cêmî bihuştê runiştîyê û bi darbirên xwe re şa dibû. Bereketa axê doralîyê xwe zêda dikir.

Ji nişkeve min deng bihîstin. Min deng baş bi şûn nekirin. Min rind guh da ser dor alîyê xwe lê ti deng nebihîstin.

Min dîsa xwe berda colê xem û xeyalan. Min dîsa deng bihîstin. Lê vê carê ji nezîkî ye da deng di-

hatin. Min derûdorên xwe nerîn. Tarîyê. Ki hîng ezî tiwêda bûm ku ronîyêke wek gogekê agir li ser merdîwanê peyda bû. Ez facinikîm û balansa xwe wenda kir.

Ser sokanê ronî wek rojê bû. Wexte ku ez hatime xwe min dît ku kûsîye kî bi qelik li ser sendelîyê xwe pan kirîyê.

Rewzeke ku insan şaş dibe ci bike. Rewzeke ku însan hîn nebûyê. Ci bikim? Ez ji şune xwe nelivîm.

Kûsî dest pi axaftinê kir; dengî wî yî mina merikê gehiştî bû.

-Ezî revî me. Revîyêkî bi serê xwe. Ax û avên dinê malê minin. Lê, ez çi qas dikanim vexwim û bixwim?(Hayda! Lê binere!)

Min dît ku Kûsî ketîyê nav ramanên kur û dirêj. Min xwest ku ez birevim. Min hêza kir ku ez rabim, Kûsî bi herekete ke ku ji Kûsî nepêyî, tişteki wek qurşine yî giran da ser omizê min û kursîyê ku ez li ser runiştî kişanda kelekê xwe. Cav li serê sor bûn û stuyê xwe yî wek serî tîre marekî berve min direj kir. Ez di cîh xwe da bûm darake hîşk.

Tirs çêşîtekî ravêyê. Cesaret tame jîyanêyê.

-Ezî ji nevalê pîrikê tême. Jûnî li min sist û mêjoyê min felç bû. Way li minê.

Duh, serî sibê bi rê ketim û nuha gehîştîme ba te. Min di hundirî xwe da bi xwe û xwe, (tu qet nehatayî! Te, ez ditîm mal xwerab!)

-Ez di kevîyê şosê re hatim. (Tu bi ber erebekê ketayî.tu ji min re dayî! Stû şikasto!)

Ji xwe re giran û giran meşîyam. Min xwest li kevîyê rê xurîniyê bixwim (axuyê bixwa)

Kûsî herkî diaxifi, ji xwe derbas dibû û wek golikeye kozîyê agir dibû.

-Ez şorê dirêj nekim. (zimanî te qut bibe îşallah). Bihnên nexweş dihatin. Bihnên egsozê ereban û asfaltê. Îştehe min kor bû. (li te bi ê elî avê ve). Min xwest ku xwe ji kevîyê rê bi dur xim. Dema ku ez ji kortê kevîyê rê derkevim, li ser piştê wek kevirê Sisifos heta jêr lut bûm. (stû di bin ve bûyo.) Min gavakê li ber xwe da ku xwe rast bikim. Cimkî, ez li ser piştê danîşim. (tu qet ranabuyâyî).

-Ez şorê dirêj nekim. Min xwe rast kir bişuve, min berîya xwe da wî xanî.(tu li ser rê bimayî mêro).

Min li kêlekî zinarekî gîyayekî xweş dit û teştî xwe xwar û ketim ser rê.(Te axu bixwara!)

-Ez nuha jî li ba te me.(Ma tu kêmbûyê yî!).

-Wexta ku ez li kevîyê rê dimeşîm, min dît ku însanan lingên xwe yê ji erdê birine, ketine hundirî hesinan. Ewê, temê doralîye xwe heynenine. (A weng dengke mal ava!). Ew ê ji bihnê gul û axê dûr ketine. Ne erdê ne jî ezmên dibînîne û ne jî temaşa dikine. (Bi-jî Kûsî). Bi germîya axê ruhê xwe pakiş nekine.

Însanên bi lez bûna. Ne çav, ne jî zik têr dixwine. Bi pirîyê qînyat nekina û bi hendikîyê nêne ser. Navînê jî nebinîne.

Însanên tirsonek bûne. Ditirsine. Lê nizanîne cîma ditirsine. Loma jî nefspîs bûne. Xwe bi nefspîsiyên xwe axû didîna. Tirs çêşîtekî revê ye. Cesaret tama jîyanê ye.

-Mala minê li piştê mina. Li kê derê dilî min xwest, ez dê li wir malê xwe ava bikim. Ez ne hevçîyê tiştên zêde me. (heyf a te kûsî). Ez î doralîyên xwe gemarî û qelerî nekim. Ne bi bermayê û ne jî bi gotinan. Ez ê axê germ û sar nasdikim. Ez ê bi bîhna tabîeta ji xwe

derbas dikim. Ez î hemî rengan bi bîhnê wanan ve dizanim. Ez î bi şev hêstirkan û hivê, bi ro rojê, ewran û ezman temaşa dikim. (Ci mêre!). Ne li ser ne jî li bin pîramidê me. Li ser axê bin ezmana nim. (Çavên te xwaro Kûsîyo!).

Tirsa min hêdî û hêdî kêm dibû. Behna min fireh bû. Kûsî te bê qey ez ji bîrkirim. Ji xwe derbas bû û ketibû trenda transê. Lê di bin cavên re ez taqîp dikirim.

-Însanan lingên xwe yê ji erdê birîna di navbarê ax û ezman da bê nasname ma ne. Hişên wanan ê lê bûna bela. (Bextiyar bi Kûsîyê delal!) Ji xwe bi dûr ketine û rêya xwe şaşkirine. Bi yeka, bê serî û bê binî ve mûjli dibine! Ew bê xwe dizanin. Tabietê, dûnêke xwe yê bi serî xwe heye. (Bijî Kûsî!)

Jikîk insan bi eqil bûye, î bi du babeta re serî xwe diêshinê. Û herdu babet jî halnekirina û haljî neke. Insan mahkûmê hişe xwe yê. (Kûsîyê Filozof). Yek, armanca hebûnê û ji mîrnîyê bi şunda çî heyê?

Ditînên Kûsî wek çemên biharê diharikîn. Hundirê min fireh dibû. Le ez çiqas dikenim ku bi Kûsî bawerîyê bikim. Bipê û bibîne.

Kûsî xuzî li xwe zîwa kir. Ji min

av xwest û bi zar xwe da berda. Dengê wî piştra zelal derket.

-Heta ku însan mîrnîyê qebûl neke, ê wek Sisifos bimîne û azad nebe!. Ez mîrnîyê nizanim. Loma jî ji însanan hîn rehatterim. Ez girêdayê insaqî xwe parastinême. Divê ku însan ji jîyanên nu re cîh veke.

Ez ji te re behsa du bîranînên xwe bikim. Herdû bîranin jî di eynê rojê da bûn. Ezî li dawîyê çiyê bûm. Hewa yê gelek germ bû. Min xwe dabû sîhê zinarakî. Wexte kû serini dekat sîhê çiyê direj bû, min giran û giran mala min li piştê min li gîyayên teze geriyam.

Deme ku dêlegurê ezê ferk kirim, zamene ku xwe badim tune bû. Dêlegurê bi pençe xwe dest pêkir ku min ji qelikî min derxê. Ez vergerandim ser pishtê, hilkishta ser zikî min. qelikê min bi didanên xwe tûj ceriband ku bişkêna. Mêskir ku ê ti avila nekê ez ser piştê li cîh hiştim û binav zinarada wenda bû.

Heme heme saetê ke bi şunda insanê ki ez ferk kirim. Min dest û lingên xwe kişandina hundirî qêlik. Wi merî ez gavê kê temaşa kirim. Piştra ez wergerandim ser pişte û ji xwe sêr kir. Mêskir ku ez

nelivima. Ez cexa ser zik kirim û pînan li min xist. Ez jê firak ketim. Heta herdê min.

Ez kirime dest xwe û hilda jor û bi lez avitim erdê (mero ti cir biwi nizam kî). Serîyê min êşî û hûndire min lihev ket. Wî însanî, ez cexa ser zik kirim. Kevir kom kirin. Siftê bi kevirên bicûk dest pêkir. Herkî cû bi kevirên gir nîşan heyne û kevir li piştê min barandin. Bi kevirêki reş û gir, li ortê piştê min xist (destên te pişkên mêro). Ne yek, ne dudi. Ez di bin xwîne ve bûm. Bê care li wê colê mem. Ci xwelîyê bi serî xwe kim! (Mala minê).

Zûraûzûra guran hat. Wî însani doralîyê xwe nêrî û da meşa. Ez wang jê xelas bûm. Da tu were, azê nikenime xwe bilivînime.

Deme ku ezê zarok bûm, ez bi celekê rovî kê re bibûm heval. Me ji hevdu pir hazdikir û bi ro û şev tevda dihilistên û me tevda wextên xweş derbas kirin. Min dît ku awê ji jêrda tê. Min hal heqata xwe jê re qat kir. Ew gelek xemgîn bû.

Rovîya hevalê min, bi qelîkî min re girt û ez kişandim sîhaya

zinarekî. Ez teselî kirim û birînên min alastin û pak kir. Ruhê min bi minda hat. Meş û moz bi dûr katin.

Rovî got; ez dê herroj werim û birinên te balêsim û nehelîm ku mêş hekên xwe bi canî te xwedî bikin. Ez pir şa bûm. Rovî berdewamkir; Ezê ji hêkan gelek hazdikir, ezî dixwazime ku biharê tu hêkên xwe bimindî.

Ez demekê bêdeng mem. Piştra min got arê. Min cand salan hêkên xwe bi rovî ve parve dikir. Min nivî dida wî, nivî jî, ji wî bi dîzkî ji bo kurkê dikira kortên ku min dikolayî.

-Du dem hene ku însanan bextawar dikin, demê eşqê û demê azadîyê.(dêûbavên min qurban kûsî bi qeliko!)

Min qet deng nekir. Guh da ser Kûsî. Wexte ku axaftina Kûsî qedîya kozîya agir vemirî. Kûsî xetirê xwe xwast û berve çîyan xwuş bû.

Doralîyen min tarî bû û ba kî sar li firîskîyê xist. 2017-06-30

Hespên westîya

Seyfî Doğan

Hespên westîya tenbel û tenbel, li şûnê xermana diçerîn. Kela kela mêh agistosê. Erd û ezmanî dikelê. Kurm û kezên xwe li ser û bin erdê, ji tinê rojê diparêzine. Insafta tirejen rojê tune.

Însanî bi hewêse bayêki hênik e. Bîrya zivistanê dikir. Benî Adem bi ti tiştî razî nebê. Ci kême we arzu dike. Dilê xwe xwestîyê. Pê qeyîl bive jî ve yê bê qeyîl newe jî. Welhesil xwestinê însanan, dawîyê xwe tune...

Kerîyêk kavok, li wê germê, ji nav strîyan rabû û berve çîyan qor bi qor firin. Qertelek li kervana kavoka bû bela û li berxweda ku kavokekê ji kervana veketinê lê tu avil nekir.

Li sîhê kanîyê ku li jêr gund e, rûniştî me. Dîsa li benda wesita ya ku pê re herim Kuluyê bûm. Dem, ji xerman hildanê bi şunda bû. Min dinê ku çavên min ditîn û mejoyê min tédigehîşt temaşa dikir.

Çend erebên hespa yê ku çorax ji Kuluyê tînan derbas bûn. Corax, axa bi xwê yê ku tavitin ser xanîya

ji bo ku dilop nekin. Ne erebecîya ez dîtîm ne jî min xwe ji wan deran kir.

Kerîyêkî mezman hata ser kanîyê. Pîlî xweyi çapê bi qatran bû. Karî tî wek maran mitî bû. Şivan li ser piştê kerê di xew ve diçû. Ne xercê herkesî ye ku kavirên nerê sê sala biçerine. Herkî wek gakî ye. Ne têrbûne dizanê ne jî westîyabûnê. Min xwest bi şivên re sohbet bikim lê nebû.

Bi tenê bûn. Ji bo min ne tu problem e. Lê tenebûna li navberê erd û ezman. Deketine kuriyê hundirî xwe û pirsên ku ji xwe dikî û persivên tunejî.

Li ezman nerî, hişê min negehiştine tişteki. Ne ezman ez fehm kirim ne jî min ezman. Em de ruhevdu dijênî. Beki tesîre min li ser ezman cî ye!? Ji ezman qelerkine bitir!..

Cîyan temaşe kir. Cîyayî inê gewr. Înên, wêk pirseke. Pirseke ku ne bêdawîyê. Lê ne ez ne jî kesên din tarixa wan insanan dizanê anjî dixwaze ku bizane. Ci hikmet e!

Min bi wê minvalê wext li xwe derbas dikir ku ba rabû, dûnê herkî cû ronî bû. Hespên westîya bi hêz bûn. Lingên peşîyê zer û yên paşîyê bi rengê zîv xemilîn û perçemen wana wek ala Kawa palpalî bûn. Ew wek yek brûsk û cemên biharê berjêr berve deştên herikîn.

Keçeke bejnê xwe wek dere genim, cîp dirêj mina qûlên atêşgeha dînî Zerduşt, nav ziraf mina Anahîta, porkej wek tirêjên rojê, Çavhêşin mina deşt û cêmên biharê, lêvsor wek kozîyê agirî sîbê, stû mina xezalek ziman wek petîyê agir û tirêjên rojê li hemberî min dawastîye.

Ez zirk bûm dawestîyam. Min demekê ew keça xezal temaşa kir bi şunda wê ez dawet kirim.

Zaravê wê, mina axê biharê nerm, xemilî û melodîq. Dengê wê wek rîyakê teze dewetkar û mina camî cêm bû. Rabûnûrûniştênê wê, kubar û nazîk bû.

Min xwe ewlê hêskir. Min di ser zimênê wê re bazda û xwe bi pîtîyên zimanî wê yî germ, nerm û ku bîna mîsk û ember jê dihatî pak kir. Bedene min sivik wek perikekî bû.

Zimanê wê yî nerm, dile min germ kir. Qilêr û gêmarê ku bi

salan li ser zimanê min gehîştîyê hevdu ku însên bêhîs û bêhiş dike, hêliya û bû lêh û bin erdê da bi lez herikî.

Lêvên sor, ji min re tîp bervehev kirin. Peyv peyda kirin. Bi havoken bieqil, dilsoz, runerm û aram dunê min dewlemend kir û rîya dîalogên bi his û hiş nişan da.

Em tevda li nav kîtebxanên dinê gerîyan. Wê rêzanîya min dikir. Behsa arkitekta kîtebxanan ji min re kir.

Xanîyên kîtebxanan bi taybetî pir caran li çîhên bilind hatibûn ava kirin û mina rojê, bajar ronî dikirin. Hundirê wanan fireh û ronî dibû. Xanîyên kîtebxanan bi rastî, ji der da gelek xweş hatibûn xemilandin û çav û ruhên insanan fireh dikirin.

Wê destê xwe kira nav destê min û em bi ru ewrenda firin û li dewletê Sasaniya li gundi Şapur daketin xer. Gundî Şapur; bajarê zanatîyê û zanan bû. Li wir, tenduristî, felsefê, teologî û ilme mûsbet gelek pêşte bûn. Gundî Şapur navande dînî mazdaizmê bû.

Hundirê kîtebxanê ronî wek rojê bû. Kîtebxane mina bexcekî bi dar, gul û gulistan bû. Her kîteb

wek mewekî darê behîştê bû. Harmoniyeke îstehê jîyanê vedikirî habû. Bîna kîteban xweş û xweş dihat.

Bi hezar û hezaran kîteb, rêz bi rêz li ser refan dabûn kêlekê hevdû. Piranî bergên kîteban ji cermên xezalan bû. Cilden wana xweş bûn.

Wê rahişte destî min û ez li kêlekê xwe li ser diwanê bi rûşkandi dam. Li min şîret kirin û got;

Dema ku mîrov kîtebekê dixwunê, divê ku însan bi çavên pirsker, bi guman û mejoyikî kirîtik lê binerî ku nezikî rastîyan bibe.

Navaroka kîteban çeştdarin; helbekekandî û derewin. Derewên netewî. Derewên qehremanî û derewên mitolojî û dînî.

Lê, kîtebên baş jî hene. Kîtebên ku perspektivên nu didin û rîyên teze bi ber însanan têxin. Kîtebên

ku rîya jîyanê ronî dikin. Gerek wanan meri ji hevdû derxe.

Wê bi zimanekî xweş û aram ku dilê min heland û ez bi colê xistim got; çavên xwe bigre û demekê bêdeng bimîne. Min gotine wê bi eşq hunî çîh.

Wexta ku min çavên xwe bi arzû vekirin, ci bibînim! Kîtebxanê tarî wek şev bû. Şeveke bêhêstirk. Kîtebxane xerab û vêran bû. Refên boş û xelîya... Hundirê kîtebxanê wek colêke bêdawî bû. Min germîya dest û nefesê wê hîsnekir. Min bi çavên pirsker li dor alîyê mêskir. Hewa ke sar xwe li min pêca.

Ew ji nişkeve wenda bû. Wek kîtebxana gundî Şapur.

2017-07-05

Ew ku da cu?

Kê ew Kîtebxane xerab kir?

PÊKENÎ – SERHATÎ

Nuh Ateş
nuhates@web.de

DALLAS

Rêzefilmê TV Dallas (1978-1991) di wexta xwe da, ne tenê li seranserî dinyayê, li gundên kurdên Anatoliyayê jî filimekî hezkirî bû. Ku te guh dida ser gilî û gotinên gundiyan yên li ser rol û taybetên serlîstikvanan vê filimî, tê bigota ew ê qala nas û cîranên xwe dikine.

Di filimê da qala serhatiya malbata Ewîng ya qelaw (zengîn) û neyartîyên di nav ferdên wê da tê kirin. Qalek jî, rekebeta di navberê malbata Ewîng û hen malbetên din yên bi nav û deng da ye. Dirêj nekim, filim li ser dijîtîya çeyî û neçeyîyê hatiye ristin. Serlîstikvan Bobî (Robert Bobby) çeyî û dilpakî temsîl dikir û Jear (John Ross) jî temsîldarê neçeyî û xerawîyê bû. Lêbîlem her du jî ji heqe rolên xwe dihatin derê.

Gula Hudê û malbata wê jî hezkirên vê rêzefilmê bûne û benda tu rêzên wê bernedidane. De tu ware wê, rêzefilm bi tirkî ye û Gulê

jî, mîna pir gundiyên wê çaxê, bi tirkî kêm dizanîye. Wê, derên filim yên ku fehm nedikirî, geh ji keçûlawên xwe yên bi tirkî dizanin pirs dikirîye û geh jî, ji rabûn û rûniştinên lîstikvanên filim meneyek derdixistiye. Carina jî wê, ji herda xwe da, gotin lihevdiyanê û dikirine devî qehremanên filimê.

Ji malbata Gulê, ew û lawê wê Tefo, mîna ku tewên, nexwaşê vî rêzefilmî bûne û bi çar çavan benda wî dipane. Tefo dolmişeke xwe hewûye. Rojekê, pêçekê di ber destpêkirina rezefilmê, mişterîyek hatiye ber derîyê mala Gulê. Wî, sewa karekî xwe î bilez, xwastiye ku Tefo wî bigîhîne qezê. Tefo gotiye; “ez vê satê naherim qezê, rêzefilmê Dallas î ku niha destpê bikê. Di pêy filîm va, ezê te pevîm!” Dayîka wî, Gulê hema xwe avêtiye navberê û gotiye; “Tefo rabe, mişterîyê te î hatiye ber nigê te, tu jî xwe dihêşînî! De rawe lawikê min, bi

gurê dayikê xwe bike, mîşterîyê xwe meşikêne, wî bigihînê qezê! Meraq meke, eza li Dallas sêyir kim û wî rind di çavên xwe ra kim! Paşê, kîngê ku tu hatî, eza ji lawikî xwe ra, ku çi bûye û çi nebûye, yekbiyek gîştikê kat kim!” Tefo vêdil rabûye û mîşterîyê xwe biriyê qezê.

Li hatinê, Tefo, ku çing ketiye hundir, tavile xwe avêtiye bogirê dayikê û jê pirs kirîye, gotiye: “Etê (dayê) film çir bû, de kat ke!” Dayikê destpêkiriye, gotiye; “Tefo Tefo, cikê te bidîya, Bobî bi Jear va xerawîyên nemayî ji hev ra kirin, sondine pir neçê xwarin. Jearê te î bi bed û nêtxerab dîsa dest pê hilebazî û neheqîyan kir, got; Bobî çi ye, ez kulê jî nadime wî, wî nêsikê tu şîrket û mîrketan nakim!? Bobî jî, xizanê min, lawî reş ji husûrizê xwe da got, hetanî ku

ez parê xwe nestînim û Jear î neheq bi dev û rûyan neynim herde, ma dayikê min jinika min we, ma dîwê alemê jina min neçê kiriwe!”

“Êê, lê Jear got çi?” Tefo dîsa ji dayikê pirs kiriye. “Ha, ji lawikê xwe ra bibêm” Gulê lêvegerandiye û gotiye; “Jear ê te yî devsist, xweli vi serî we, wîîyî ku tu roja newîne û destpîyê xwe qe baneke, got; Tahooo, ez kî me lawooo, ku min stûyê xwe li ber Bobîyê qûn-bieq xar kir, bi sonde rû dunê we, bi şerda we, bi Kelamqedîma we, ez ê herim, li meydanê li pêş Camîyê (mizgeft) mîna kera bizirim!” Tefo gotiye; “Haho, etê lê çir kir! Etê etê, li Amerîqayê Camî ji ku da hatiye?” Dayikê lêvegerandiye, gotiye, “lawê min qe devê şorê î wenge, yanê li meydanê bajarî wan!”

Bêjenasiya gotina Kurd

Amed Tîgrîs

Hemû dîrokna hemfikirin ku kurd ji pênc hezar salan ve li ser axa xwe dijîn. Axa kurd ji destpêkê ve di navbera gola Hezarê, gola Wanê, çiyayên Zagrosan, çemên Tîgra (Dicle/ Tîgrîs) û Feradê jiyane.¹ Nîştîmana kurdan a kevnare û pîroz ev der e. Lê, ez ê di vê nivîsa xwe de, ne li ser dîroka kurd û Kurdistanê, bi tenê li ser bêjenasiya (etîmolojiya) peyva kurd rawestim ka wateya vê gotinê çi ye?

Hûrîyan ji xwe re gotine hûradî. Di zimanê hûrîyan de gotina hûradî tê wateya şervan, çalakvan. Wek tê zanîn hûrî, mîtanî, sûbarî, kasî û hatî (hîtîtî) bavûkalên kurdan in. Koka van hemûyan ezbedan (eşîran) yek e û her yek eşîreke nimandî ye. Hinek bêjenas (etîmolog) dibêjin gotina xurt (hêz) ku îro hîn di kurdî de tê bikaranîn, ji horediya hûrîyan we-rar têperiyê û vê formê nû girtiye. Cîranên kurdan ên wê demê jî li

gor formasyona zimanê xwe van navên jêrîn li kurdan kirine.

Li ser bêjenasiya peyva kurd çend teorî hene ku ji derî çend cihêtiyên biçûk hemû ji aliyê naveroke û wate ve nêzîkî hev in. Di pehlevî de **kerd**, di hatî de **kard**, grekî (yunanî) de **kardia** û di latînî de jî **crdo** e ku hema hema di van hemû zimanan de ev peyv tê wateya mêrxas, cesûr û bawerdar.²

Du gotinên pêşiyên kurdan hene ku ji wê demê ve heta îro di nav kurdan de wek soz û peyman in: “Sozê mêrê berê. Yê mêran soz e, ne toz e.”

Di zimanê sanskrît de gotina kurd tê wateya çalakvan, lezgin ku ew jî ji gotinên mêrxas û cesûr ne dûr e û di heman wateyê de ye.

Di zimanê sumeriyan de kur navê çiya ye. Piştî ji peyva kur di wateya welat de jî bi kar anîne. Ji welatê xwe re jî di wateya welatê mezin de Kurgal gotine. Kur

¹Navê çem ne Dicle ye Tîgra ye. Ji ber ku tîj û tik tê wî navî lê kirine. Ewropî jî Tîgrîs dibêjin. Tîgrîs jî, ji gotina Tîgra tê. Yunaniyan Tîgra li gor formasyona zimanê xwe guhertine û Tîgrîs gotine. Ewropî jî gotina Tîgrîs ji yunanan girtiye û îro jî dibêjin Tîgrîs.

² Ali Husein Kerim, *Kürtçe Etimolojik Sözlüğü*, Weşanên Înstîtûya Kurdî ji bo lêkolîn û zanist, r.379

Zagrosî ne û her ku keys dîtine êrîş birine ser Kurgalê (Sumeran) û dagîr kirine. Kur bûye mijara helbest û mîtolojiya sumeran jî. Herweha sumeriyani ji Kurê re welatê Miriyani jî gotine. Xwedawend Înnana li welatê Kurê di nav mij û moran û qeşayê de derketiye serûveneke bive û mezin

Îro jî bi zaravayê dimilî (zazakî) û soranî ji çiya re koy dibêjin.³ Di zaravayê kurmancî de peyva koy wenda bûye û bi tenê di navê ajelên kovî de ango ajelên çiyayî de maye. Wekî pezkovî, gakovî, pisîka kovî, mirovê kovî. Yd.

Di serdema sumeran de kurd li derdora çiyayê Zagrosan bûne û loma sumeriyani ji wan re di wateya mirovên çiyayî de kur an kurt-tî gotine.

Xesenephon di artêşa Kîrosê grekî de fermandar û nivîskarekî bi nav û deng bû. Bz. di sala 401ê de artêşa grekî ji Îranê bi paş ve vedigere û dixwazin di nav Kurdistanê de bigehîn Derya Reş û ji wir jî herin Kostantînpolisê (Îstanbula îroyîn) û ji wir jî herin welatê xwe Yunanistanê. Di çiyayê Kurdistanê re têdiperin. Li herêma Botan li çiyani asê dibin û rê dernaxin. Li wir

rastî gundiyan şervan û çalak tên. Gundiyan herêma tîravêjên herî jêhatî ne. Di navbera artêşa Yunan û xelkê binecî de şerên dijwar diqewimin. Xesenephon di pirtûka xwe ya Vegera Dehhezaran (Anabasis) de behsa wê herêma, gelê binecî û şervaniya wan dike. Ji wan re kardûxî dibêje.

Gelo çima gelên wê demê gotina kurd weha cuda wekî kur, horadî, hûr, hor, kard, kardîa, kir, kerd, crdo, korîo-s, kotî, kûtî, gûtî, kardo, kardûx. yd. gotine û nivîsandine? Her çiqas koka van gotinan yek be jî, du sedemên girîng û bingeîn hene ku navê weha cuda li kurdan kirine. Ji wan herdu sedeman yek jê ew e ku heta salên 750-725an ên bz. tîpên dengdêr (vokal) nehatibûn dîtin. Wê demê bi tenê tîpên dengdar (konsonant) hebûn.

Xwendina pîktogram û hîeratî sumerî û hîeroglîf û hîeratîyên misrî gelek zehmet bûn. Hîn îro jî di tîpên erebî de alozî û sergêjiyên dengdêran hene. Di wê demê de, berhem bi tenê bi dengdar û sembolan dihat nivîsandin. Ji derî tîpên dengêr di tîpên dendar de jî alozî û sergêjiyên mezin hebûn. Al-

³ Samuel Noah Kramer, Sümer Mitolojisi, Kabalıcı Yayınları, s. 142

fabeyeke giştî tune bû. Her gelî an fermanrewayî li gorî xwe dinivîsand û li gorî awayê zimanê xwe nav li gelê din dikirin.

Gotina kurmanc jî gotineke hevdudaniye ango ji du gotina pêk hatiye. Di zimanê hurî de gotina kir tê wateya azad, serbest. Man jî tê wateya mirov. Hîn îro jî ewropî

ji mirov re man dibêjin. Kir û man dibin yek gotin û dibe mirovê azad.

Di pehlewî de gotina korios tê wateya şerker û manus jî tê wateya mirov ango zilam. Herdu gotin dibin yek û dibe kurmanc. Kurmanc tê wateya lehengê ku mirov dikare pê bawer bike, pişt pê girê bide.⁴

10.07.2017 Stockholm

Referens

Alf Henrikson & Björn Berg, *Alla Tider en Världenshistoria*, Borås-1995

Ali Husein Kerim, *Kürtçe Etimolojik Sözlüğü*, Weşanên Înstîtûya Kurdî ji bo lêkolîn û zanist

Samuel Noah Kramer, *Sümer Mitolojisi*, Kabalcı Yayınları 2001

Samuel Noah Kramer, *Tarih Sümer'de Başlar*, Kabalcı Yayınları 1999

Rodney Castleden' *År För År När hände vad i världshistorien*' Bokförlaget Tre-tre södertälje-1996

Thomas R. P. Mielke, *Înnana*, Yurt Kitap-Yayın, Ankara-2000

Amed Tîgrîs, *Perwerdeya bi zimanê dayikê û Pirzîmaniya Fermî*, Weşanên Apec, 2009

Ekrem Cemil Paşa, *Dîroka Kurdistan bi kurtebirî*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Brukselê, 1995

Xerzî Xerdan, *Navê Kurd û Kurdistanê Di Dîrokê De I*, PDF

⁴ Her çiqas durê aqil be û efsane be jî ditineke din jî heye ku li Kurdistan, Îran û Hînistana antîk li gorî ola aryanî ya kevn navê ferîşteyê (melekeke) *Kurmanhal* hebûye. Kesên ku bi wî ferîşteyî bawer kirine re *kurmanc* gotine

Û Pollyanna xokuşî kird

Rûjhat Esîman

Vercîki her tiştî, Pollyanna kî ye? Pollyanna, kîtawî ke we nûskarê we nawi Eleanor H. Porter ew hatiwî nûsandin e. Le ew qatî, l’Amerîka ey kîtaw, salê 1913 xeylî zêde hat nasîn. Nûskare îj we rî eyi nawdar wî. Le naw kîtawe, Pollyanna Whittier çûnde dötî bûçik, we bawik û mîmikê xo ew wazî diçayaye: Waziyê Dilşayî. We ey wazî, dîyataye xwestin ke Pollyanna le zindegîye, le her mesele wû dilşa û pozîtîf guman wikerî. Ra eyi, ray qeysik dan. Ke dilşa wû ke ewi we kar nêyarî. Welê, rûjî qezeyî wî û Pollyanna qatî kem birrîndar ma û rî neçig. Welê, düaca gî, cardin belaşaye rîçigîne xo. We eyi ew, qêyrê dilşayîyi zanist û zindegîyê xo we kenîn ranand.

Îmro, we rîyê ey enasige, îsangel ra xerawîgeli xoyan ke dixwazin sererastê wikerin, ra xoyan “Pollyannaism” derxistin holê. Çûnkî, Pollyanna tena nawî newî. Manedarîyi xo we “başitî, rinditî, başfikirî, xoşhîsdarî” wî. Zindegî zûr e û îsan dixwazî rîyî ewkirî ra xo.

Welê, la kurdgel çûn e “Poll-yannaism”?



Eleanor H. Porter di 19ê çileyê paşîn, 1868an de li Littleton, New Hampshireyê hatiye dunê û 21ê gulanê, 1920 (salî 51) li Cambridge, Massachusettsê, mirîye.

Porter bi piranî wêjeya zarokan, çîrok û roman nivîsîne. Romana wê ya herî pir hatiye naskirin *Pollyana* (1913) e.

Îme cardin wiçîn Amerîkayê salgeli nûa û elgîn salê 1913yi û ra nûskar Eleanor H. Porter wişîn:

“Werêz Porter, tu ditanê Pollyanna wikerê kurdî û enasigê eçe winûsê?”


Porter: “Arî, ditanim.”

Temam e. We destûrdanê nûskare ew, îme dibelaşîn enasigê Pollyanna...

POLLYANNA (15.02.1994)

Pollyanna, le dêyê xo hertim wazî diwazaye. La ewi, zindegî rind wî, xas wî, bîderd wî... Xeylî dilşayîyê didar wî. Bawik û mîmikê Pollyanna, ray diwîşayin: “Dötîkeman, tu qet newedil, nezindegîhez, nexoş, bîdil mewa. Tu hertim xoşit we zindegî wiyay, we heywangel, îsangel, xoza û Xoda wiyay. Pollyanna rayan diwîşaye: “Arî baw, mîmî... Baş e ke îwe hestin, îwe ha le hendim in, min firê xoşim wêtan dîyay...” Dengê Pollyanna xoş wî û we Kurdî firê guranîgeli dengbêj diçirraye. Xoşî we helwestgeli Feqîyê Teyran, Exmedê Xanî, Pîremêrd dîyataye. Herrûj we Kurdî verdi zarûgeli hamsal guranîgeli zindegîpîrr diwîşayin. Segîkê Pollyanna hewî. Nawê Çawsîyê wî. Pollyanna hertim verdi Çawsîyey xo digerdayin le qazgel, çemgel, darisangel... Rûjî Pollyanna hatiwî male. Hatiwî û mirdinîyê mîmikê xo dîwî. Bawikê le urre newî, le kare wî. Tena mîmikê Pollyanna nanê êwarigî dikeraye, ew qat ayimgeli xeraw hatiwîn male û jini tena dîyin. Ê kuştîwînê. Pollyanna le mirdigê mîmikê xo dingiraye û digîraye. We qirrandinê ewî w dêyîgel hatin hêli Pollyanna û ewane îj dîwîn ke regezperistgel mîmikê Pollyanna kuştîwîn. Polê, bîdeng mawî.

Bawik hat. Ê keft le seri herdu çoke-li xo. Gîrist. Rûjê dine, le gûristane, Pollyanna verdi bawike wî. Bîdeng wî. Hatin male. Bawikê, qerar da ke wiçîne dûrgel. Hatine Istenbul. Pollyanna, bîdeng, bîzwan û çûnde mirdig wî. Çûnkî, malê, hamrîgelê, segê Çawsîyê, çemgel, qazgel le dûa û dûrgel mawîn. Îga Pollyanna, hem le xo, hem îj le gir-di xo bîyanî wî. Nêzanaye çe wikerî. Wazî nêwazaye, nan nêxwaraye. Le kuçeye ke nû bar kirdiwîn, hamsangel rûsî, çawteng wîn. Hemi kest we zwanî bîyanî, wînêdin qise dikerayin. Bawik, diçaye karî û şew dîyataye male. Pollyanna îj le male karê pêkkirdini dikeraye. Wazîyê dilşayîyê çe wî? Qet. Tiştî nîyataye vîrîyi Pollyanna. Hewa, karê mali dikeraye û vîrî êlê xo dikeraye. Dalikê, rûje ke Pollyanna hatiwî dûne, mirdiwî. Bawikê Pollyanna êwarigî, we dest û pa xûndar hatiwî male. Pollyanna hûşê çig û heman çig aw hawird da bawikê xo. Ra ke, bawikê we Kurdî guranî çirrandiwî, we lay kargergeli regezperist, hatiwî bîrîndarkirdin. Digan û pûzê xûndar wî. Pollyanna, nêtanistaye fehmê wikerî. Herra eçe kirdiwîn? Dilê Pollyanna we zindegîyê, sê wî. Xoşî we îsangel, zindegî nîyataye. Nêtanistaye hez wikerî. Xawindê male, kîrêy du mange dixwazaye. Barnamegel herrûj



zêde diwayin. Perê nexoşxane ra bawikê newî. Xwardin le male newî. Hamsagel xoşîyan wêyan nîyataye. Gobelgeli taxe hertim le Pollyanna kifirî dikerayin. Dötgeli taxe ke ham-sali Pollyanna yin, wê dikenayin. Wê diwîşayin: “*Pîs Kürt, defol geldixîn yere! Senî îstemîyoruz!*”


Çe diwîşayin? Çe mane we ey wişegel hewî? Nêzanaye. Pollyanna verdi zindegî qêr kirdiwî. Çûnkî êşê Kurdwûne dikîşaye. Pollyanna we Mêrdîn wî. Kurd wî. Zwanê, Kurdî wî. Çûnde “terörist” dîyataye nasîn. Pollyanna bûçik wî. Zindegîpirr wî. Çûnde babû wî heta ey sale. Düaca çe wî? Êş, xûn, regezperistî, nehezî... Ra çe? Rujê Gîgîne, bawikê mirdiwî. Perêyan ra nexoşxane newî. Xwardinîyan, dermanîyan newî. Heway zimistan tij wî, kuşer wî. Xawindê male dîwî ke Pollyanna bikest ma, xwest ke ra xo wikerikê jin. Pollyan-

na vit na û xo awît kuçegeli Istenbul. Male hiştîwî. Çig cîgeli têrik ke kest newînikê.

Firê tirsag wî. Birsig wî. Tênis wî. Le girdi çopî kêrdî dî, birdê. Carî, dalikê, bawikê, mîmikê, zindegîyê, hamrîgelê, êlê, segê, qazgelê, çemgelê, Mêrdînê xo hat ver çawê û Pollyanna xokuşî kird...

Sewazû, le rûjnamegeli Tirkîye ij eçe hatiwî nûsandin:

“Bu sabaha karşı İstanbul’da, çöp kenarında karnına bıçak saplanmış bir kız çocuğunun cesedi bulundu.”



Gora Eleanor H. Porter

Li Swîsrê hîndekariya kurdî

û tevlêbûna ciwanên
kurdên ji Anatoliya Navîn!

Hesen Huseyîn Deniz



Neh sal in li Swîsre dijîm. Wekî ge-
lekan bi sedemên siyasî yên tîn zanîn
hatim vê derê. Piştî hatina min û for-
malîteyên serlêdanê wan ez dam ba-
jarekî biçûk. Li wir tişta destpêkê min
ferq kir, pêwîstiya bi hîndekariya zi-
manê dayikê bû. Malbat bi zarokên
xwe re bi tirkî dipeyvîn, tevî ku bi
kurdî dizanîn dîsa jî bi zarokên xwe re
bi tirkî dipeyvîn. Ma ev ne ecêbek e?

Dilê min ev yek ranekir û min jî
malbatan xwest ku em zarokan hînî
kurdî bikin. Hinekan got: „Dema
zarokên min tine ye.“ Hinekan got
„Ewê baş bibe“.

Li wê derê komeleya kurdan jî ti-
ne bû ku em odeyekê jê bixwazin û
zarokan hînî zimanê dayikê bikin. Li
komeleyek Îtalî bi çend zarokên ji 7-
16 salî min dest bi hîndekariyê kir.



Pişt re me ev yek derbasî dibistanên fermî kir. Ji wir me xwe vegirt bajarê mezin û pişt re jî vegirt giştiya Swîsre.

Niha li gelek deverên Swîsre bi awayekî fermî em bi navê Komeleya Hîndekariya Kurdî zarok, ciwan, mezin û kesên biyanî hînî ziman û çanda kurdî dikin. Çîroka vê yekê dûvdirêj e; me çawa dest pê kir, çi zor û astengî hebûn, dîtî û peydekirina cih û zarokan, vekirina komeleya hîndekariyê, meşandina wê, civandina malbatan, kizirîna di rûnê xwe de û gelek tiştên din... Her yek mijarek bi serê xwe ye ku mirov carekê li ser binivîsîne. Lê li vê derê ezê wiha bi gelemperî ji we re qalê nekim; di vê nivîsê de armanca min hinekî bi sînor e, dixwazim beşek ji xwendekarên xwe bi we bidim nasandin.

Xwendekarên hîndekariya kurdî ji gelek derdorên Kurdistanê û ji Swîsreyîyan pêk tînin. Carinan di hîndekariya mezinan de hijmara kesên Swîsreyî bi ser a kurdan jî dikeve. Ev jî tişteki baş e. Lê di nav xwendekarên ji Kurdistanîyan tev li hîndekariyê dibin de beşekî mezin ji kurdên Anatolya Navîn pêk tê. Dixwazim hinek nêrîn û şopandinên xwe yê wiha li ber çavên min ketine bi we re par ve bikim.

Ciwanên ji Anatolya Navîn bi hijmareke çê xwe tev li hîndekariya kurdî



dikin û pirahiya wan angû mirov dikare bêje hema hemabi gelemperî keç in. Li vê derê jidayik bûne angû di temenekî biçûk de tevî malbata xwe hatine vê derê. Li vir hînî zimanê elmanî bûne û di nava malbatê de jî dayik û bavê xwe, ji xizmên xwe kê-



zêde kurdî girtine. Têgihîştina wan a kurdî heta astekê heye. Bêguman pêwîstiyê bi nivîsandin û xwendina kurdî dibînin.

Ya grîng ew e ku ji kevneşopî û çanda xwe dûr neketine. Çanda Swîsre û ya kurdan pêk re dijîn, lê herduyan tev li hev nakin. Mirov dikare bêje bi kurdan re kurd, bi swîsreyîyan re swîsreyî ne. Ev yek jî nîşaneyê baş a întegrasyonê ye. Tê zanîn ku gelek kurdên ji geêlek derdorên din ên Kurdistanê hatine Swîsre li şûna întegre bibin, asîmîle bûne. Gava hatine Swîsre dev ji zimanê dayikê, çanda kurdewarî û kevneşopiyên xwe berdane û serserkî ketine nav çand û zimanê swîsreyî, lê belê hêz û zanebûna wan têrê nekiriye ku vê yekê jî baş bigrin û hiliyane, çûne. Kes nizane êdî bê ew çi tişt in. Lê kurdên Anatolya Navîn nakevin nav vê kategoriyê. Ew dixwazin zimanê xwe hîn bibin û li pêş bixin. Bi malbat û derûdora malbatê re li gorî kevneşopiyên kurdewarî didin û distînin, tev li xebatên çandeyî û civakî yên kurdan dibin, di dilê wan de dîtina Kurdistanê û xizmetkirina ji Kurdistanê re heye û ev yek wana li ser lingan û zindî digre.

Gava ez wiha dibêjim, bila kurdên ji Anatolya Navîn ji ser xwe neçin û kurdên ji bajar ango derûdroên din

dilê xwe megrin ango bi halê xwe neşewitînin. Bê guman ji her derûdorê yên dildarê kurdewariyê û yê ne dildar hene. Ev tiştên ez li vir qalê dikim ne pîvaneke ji bo gelemperiya Kurdistanê ye. Tenê nêrîna xwe ya li ser kesên beşdarî hîndekariya kurdî dibin, dixwazim bi we re par ve bikim. Yan na xwendekarên min ji Mereşê jî tevlêbûna xwe çêdikin, ji Semsûrê jî, ji bajarên din jî hene û hijmara wan jî carinan zêde dibe. Lê mijara nivîsa min ciwanên Anatolya Navîn e. Ji ber ku ew bi dildariyê xurt û domdar cihê xwe tê de digrin.

Niha dikarim derbasî mînakên pratîkî bibim:

Ciwanên ji Anatolya Navîn li vê derê bi pirahî dibistan xwendine û yan bûne xwediyê pîşeyekî yan bûne mamoste û yan di karekî din de xwe bi cih kirine. Niha ji wan çend xwendekarên min îsal mamostehî qedandin û dest bi kar kirin. Bê guman ez bi wan pir serbilind im, ji ber ku di dilê wan de heye, rojekê zimanê xwe yê dayikê li pêş bixin û ji zarokên kurdan re jî mamostehoyê bikin. Ev yek hêviya kurdan e û ciwanên me vê hêviyê didin. Ji xwe yek ji wan ev çend sal in tevî min bi dildarî ji bo zarokên kurdan mamostehiyê dike. Yek-du di rêveberiya Komeleya Hîndekariya



Kurdî de cih digrin.

Tev jî bi dildarî amade ne ji bo kurdî kar bikin. Yek di warê folklorê kurdî de xizmetê dide, yek di warê perwerdekirina hêlîna zarokan de, yek ji bo zarokên penaber alîkariya dersên wan dike.... Ev tev jî ji kurdên Anatolya Navîn in. Bê guman yekelebên ji Dêrsim, Mereş, Mêrdînê jî di navê de hene, lê bi pirahî ji kurdên Anatolya Navîn pêk tên.

Di salên derbasbûyî û herî dawîn îsal çend caran ji bo alîkariya zarokên penaber bûne, yê li Kurdistanê, mînak; yê ji Kobanê û Şengalê derketine û hatine li Amedê bi cih bûne, li Başûr bi cih bûne, xwendekarên min xebatên bê hempa kirin. Ev karê kirine hêjayî gotinê û qalêkirinê ye. Li malê xwarinên wekî şêranî û şoranî çêdikin, li kolanê li ser pêşangehan ji sibehê heta

êvarî di bin serma û seqema Swîsre de yeko yeko difiroşin û pereyê yeko yeko kom dibe, didin ser hev û bi vî pereyî ji bo zarokên penaber bûne dixwazin alavên dibistanê, kinc, pêlav û hwd. bikin û diyarî bikin. Sala beriya vê ji bo nêzî şeş sed zarokên li wargehên penaberan ên li Amedê, yê ji Kobanê û Şengalê koçber bûne alavên dibistanê, ji bo jinên ciwan mekîneyên dirûnê, dîsa ji bo penaberên li Sirûcê bi cih bibûn qûtê xwarinê hat kirin. Sala çûyî ji bo pêncsed zarokên ji Rojava yê li Başûr pêlav û îsal jî ji bo du hezar zarokên êzdî yê li sê kampên li Başûr pêlav û alavên pitikan hatin kirin û tevî xwendekarên xwe yê ji Anatolya Navîn em çûn wê derê û bi destê xwe diyarî dan zarokên kurdan.

Ev kêmek xebatên xwendekarên min ên ji Anatolya Navîn in, bêguman

di nava wan de kêmek xwendekarên din jî hene, divê ez mafê wan nexwim, lê bi pirahî yên ji Anatolya Navîn in, divê mirov heqê wan jî nexwe.

Ji bo vê mijarê xala grîng ez bînim ser ziman, dîsa vedigere tê ser întegrasyon û asîmîlasyonê. Gava mirov tev li ziman, çand û civakeke nû dibe, ger dev ji ziman, çand û civaka xwe bernede û ji civaka tev lê dibe tiştên baş bigre û yên xwe û yên wan pêk re bimeşîne, di nava danûsitendinekê de be, ev yek dibe întegrasyon û li gorî nêrîn û dîtina min, xwendekarên min vê yekê baş pêk tînin. Dîsa mînakekê bîdim ku cih bigre; xwendekareke min a ji kurdên Anatolya Navîn di rojên dawî de ji bo lipêşxistina zimanê Ingilîzî çû Îngilîstanê. Ji wê derê hefteyê carekê ji min re bi kurdî nameyekê dişîne ku jê re sererast bikim û bi vî awahî ew vakahiya ji dersan maye, dadigre. Ev yek bi tena xwe nişaneyê hezkirin û dildariya kurdî ye.

Hêvî dikim ku hemû kurdên li derveyî welêt dimînin, wekî xwendekarên min li ziman û çanda xwe xwedî derkevin û bi vî awahî pêşî li ber asîmîlasyonê bigrin, ji bo zarokên kurd û pêşeroja xwe û zarokên kurdan li çand, ziman, kevneşopî û nirxên kurdewarî xwedî derkevin.

Kurd li ser kîjan axê dibin bila

bibin hebûna xwe û nirxên xwe tenê dikarin bi bikaranîna zimanê xwe û jiyandina çanda xwe zindî bigrin. Ji xwe dagirkeriyê kurd felişandine. Hal di wan de nehiştiye. Gava diçim mala kurdekî û dibînim ku televizyona tirkî li wir vekirî ye û jina wî li rêzefilmên tirkî temaşe dike û zarokên wî tîn pê re bi tirkî dipeyivin ez qehr dibim û hema dixwazim ji wê derê derkevim biçim. Tu kurdek î, ji ber sedema ku dewleta tirk a dagirker cih û war û jîyan li te teng kiribû tu derketiyî derveyî welêt û hatiyî xwe avêtîyî bextê Ewropîyan, çima kîn û nefreta te li hemberî dagirkeriya tirk û nirxên tirkîtiyê tine ye û çima tu vê yekê ji xwe napirsî. Dijminê ku tîpeke tenê ji alfabea te napejirîne, hebûna te napejirîne, mafên te yên herî bingeîn ên jîyanê jî napejirîne çima ewqasî bi te şêrîn tê? Çima tu roj bîstûçar saet zimanê wî bi kar tîni û zimanê xwe yê ji kûrahiya dîrokê tê biçûk dibîni, bi kar nayni? Çima zarokên te li Ewropa hîni tirkî dibin, lê hîni kurdî nabin? Çima zarokên te li Ewropa diçin dibistanên tirkî, lê naçin dibistanên kurdî? Tu kurdekî çawa yî? Te li ser navê kurdewariyê li vir îltîca kiriye, lê mixabin rojekê peyveke kurdî ji devê te dernakeve, bi zarokên xwe yên nû jidayik dibin re bi tirkî dipeyivî? Ci-



vaknas û derûnînasên cîhanê divê li ser vê yekê lêkolînên ecêb bikin. Ev çi mirov e, çi netew e ku nîrxên dijminê xwe di ser yê xwe re digre û dibîne? Ger zimanê te biçe, di te de ji kurdewarî tiştêk namîne, tu dibî wekî qalîkê lîmona givaştî.

Bi vê sedemê divê mirov dildariya kurdî ya ciwanên Anatolya Navîn ji bo kurdên din ji wekî mînak bigre û

hemû ciwanên kurd li ziman, çand û nîrxên xwe yê kurdewarî xwedî derkevin û ji bo zarokên kurd xizmetê bikin ku pêşeroja me hebe û tarî nebe.

Têbinî: Niha ji bo zarokên kurd ên li derveyî welêt dijîn em 19 pirtûkên dersdayîne ji bo neh salên dibistana seretayî û navendî û saleke hêlîna zarokan amade dikin. Ev yek ji bo zarokên kurdan derfeteke grîng e.

Kilamên me

Mem Xelîkan

ZÊWIK

Her gelek, derd û êşên xwe, dilşayî , evîn û sewda yên xwe bi stran û kilaman tînin ziman. Ew, perçeyekî çand- kultur û folklor (Gelnasî) wî gelî ye. Ewana, Dewlemendî ya çand, kultur û zimên in. Kurdên Anatoliya Navîn (KAN) jî, bi wan stran û kilaman, bi zimanê xwe, jîyana xwe, êş û elemên xwe, sewdayên xwe anîne ziman, çand û gelnasîya xwe dewlemend kirine. Nivîskar, lêkolîner û Kurdo-logê bi nav û deng Celîlê Celîl, di hevpeyvînek xwe de dibê: „Zeman, dijminê folklorê ye.“ Rast e. Dixwaze, mezinên civakê çand, kultur û folklor xwe, ji yên dûv wan re tînin bikin qezenc. Dema me mezin wenda kirin, çand, folklor û serpehatiyên wan jî, vi wan re wenda dibin. Her gel û netawek, bi ziman çand, huner û gelnasî ya xwe li ser linga dimîne. Berhevkirin û arşivkirina, huner û kultura mezinan, ji bo wê girîng e.

Li Anatoliya Navîn, nav Kurdan de pîr meriyên şare (mêr an jî

jin) hene. Wana, bi kilam û stranên xwe jîyan dewlemend kirine. Ezî li jêr kilamek şîna, ji kilamên KAN bi hekata wê ve tev binîvsînime. Dema meri lê dinêre, hekat û kilam yeke yek li hev tînin e. Eşa Rostê, êşa dilê xwe, bi zimanekî xwaş û zelal anîye ziman. Meri, di wê kilamê de raste peyvên li heremê wendabûyî, an jî li ber devê wendabûyî jî tî. Wek; (Lêmîşt=Mil, Kêşk=kızı, Gaz:Yüksek, yukarı).

Eşa Rostê, ji Xelikên jor (Konya-Kulu- Qerecdax) e. Keça wê Zêw, 15-16 salî û bi dergîstî ye. Dergîstê Zêwê, li Dersimê esker e. Eşê, Tevneke xwe dagirtîye. Ji bo cîzê Zêwê amedeke, xalîyekî bike. Sibekê, li ber tevna xwe rûdine û Zêw jî, jê re birekê dibire û alîkarîyê dike. Wê rokê, mîyeke Eşê zayîye. Sewêk berxa xwe neqefile, kiriye nav cilekê anîye li ber tevnê berx dayê kêleka xwe. Cîranekî Eşê, tî li kêleka wê li ser cilê rûdine. Ne vî hayjê berxê heye, ne jî hatiye bîra Eşê ku bê berxê di nav cilê de ye. Cîranê

wê radibe dihere mal şûva, Eş mès-dike berxa wê miriye. Dina Eşê, bi serê Eşê de dixele û nizane çi bike. Ji hêrse xwe re, kêra didest de ku pê yana dibire, di Zêwê kew dike. Kêra xopan, tere di jûniyê Zêwê de tere xar. Zêw birîndar dikeve û birîna wê her ro derbas dibin li ser giran dibe. Zêwê, toxtor bi toxtor digerînin, lê tu çara nabînin. Bi ser wê birînê de Eş, Zêwa xwe ya delal wenda dike û Zêw, dihere ser dilovanîya xwe. Ji bo ku dozger (savcı) were kewşê, meyîtê Zêwê, sê rojan di mizgeft (Camî) a gund de digirin. Mêsdikeyn, meyîtê Zêwê bîn jê te ye û genî dibê. Meyît tînin bişon, kes ji gundîyan, ew meyîtê bîn bi ser ketî naxwaze bişo. Eş, meyîtê Zêwa xwe ya delal bi xwe dişo û dibin dikin goreke ser negirtî, benda dozger dipên. Eş, bi ser wê êşa giran de dixwaze bi kilama, şevata dilê xwe vemirîne.

ZÊWIK

*Vana çîyana bi lêmişt in
Qirik û qertel lê danîştin
Gundo kê va ecîba diyîne
Meyîtê kêşkê bi dê şuştin*

*Tile tile Zêwo til e
Baran barî herdî şil e*

*Hevalo go Zêwo kêdere te têsê
Go kêr liket junî ye minî kul e
Deme deme Zêwo deme
Min Zêwik bire Konyê
Kire xaniyekê bi cam e
Toxtora go dê gawir keçik îslam e*

*Zêwo Zêwo Zêw delalê
Sê ro ne camîyê de bê hevalê
Xalî Zêwikê minî kirkitî ye
Dorê di dest de bi nîvi ye*

*Ha bû ha bû Zêwo ha bû
Kuçikê şarê li sêri ba bû
Dergîstê xwe eskerê Dêrsimê hatîye
Nizanim Zêwika min di qebrê de girî,
nizanim şa bû*

*Li tatê Zêwo li tatê li tatê
Pêşîya eskerê Dêrsimê belav tê
Eza rûnim li dawîya civatê
Jê re katkim vê hekatê*

*Li gazê Zêwo li gazê li gazê
Cinigê Zêwikê min ê
spî ne mîna qazê*

*Bane mixtarî gund kin
Destê min kelepçe ke
bavê hepsa Sêwazê*

*Eşa Rostê
(Xelikên Qerecdax)*

Quncikê Aşgozelê

Li kuriklîxi min ji gund heznedikir. Ji bo ku gund bi her tiştên xwe, ji jîyana min a ku min hetanî wan salan ditî (kuriklîxiyê), cûda bû... Ne mîna bajarê Tirkîyê bû û ne mîna Ewropê bû. Bîhna xwe tirş û kermeyî bû. Her der tijî mêş bû, mirov bigota, gundê mêşa ye. Heywan pir bûn û ez ji heywanan qet hez nakim. Min ji paçkirinên şilûpîl yê jînên gund jî nefret dikir. Lê dîsa jî tiştêkî taybet hebû li gund, vê jî bala min dikişand. Ji ber ku ez ta hîngê va meraqlîya tîyatro bûm, sohbet û mehetên jînên gund, mîmîk û dengkirinên wana pir bala min dikişand...

Dubare; erê, min çiqas ji gund heznedikir, lê ewqas jî ji jînên gund hez dikir. Li derva kurik dilîstin, ez jî li kêlekê etkê xwe rûdiniştim û min li jinan temaşe dikir, guh dida ser wan. Ev ji bo min wek filmeke kartonî ku kurik jê hezbikin bû. Min çima vana niha nivîsandin?... BÎRNEBÛN... Îsal bîstaliya Bîrnebûnê ye. Ez dibêjim Xwedê ji xudanên Bîrnebûnê razî be; ez li Almanyê ji dayik bûm û li wir mezin bûm. Dayik û bavê min kurmançî pir baş deng dikin lê lê vîber min nexistin. Ez bi tirkî mezin bûm. Ji bo wê kurdîya min ne baş bû, ez bêjim fehm kirin hebû, lê deng kirin qet tunebû. Di sayê mereqa min ya ji bo jînên kurd yê li gund ez kurdî êvisîm Li Almanya jî meriv, dost û cîranên kurd dihatin malê me, ez tim li ba wan

bûm. Hêdî hêdî min cesarete dengkirinê kir... Dîsa Bîrnebûn: Bîrnebûn hat û li ser koma zanîna min wek taçek bi şûn bû. Xwendin û nivîsandin... Zimanê Bîrnebûnê ez bêjim ji bo min gellek nermik û xweşik e, çima ku pir nêziya zimanê dengkirinê ye. Destpêka xwendina Bîrnebûnê ji bo min heyecaneke xweş bû. Min dixwend, erê min dixwend û him jî fehm dikir. Vê cesareteke mezin da min û vê carê jî min dest bi xwendina pirtukên kurdî kir...û...û...û nivîsa min a siftê ji bo Bîrnebûnê. Erê, ez êdi hazir bûm, min got çima tu nikarî binivîsîn!? Lê li ser çî? Gerek bû tiştê ku ez li ser binivîsim kerekêrîstîka min be. Çi bû ew? Jinên gund, jîyan û hikayên wan. Ez bûm Aşgozel; geh bûm dayika Faruk, geh bûm nizamî çî! (Her hebe) Bîrnebûnê derfîyê xwe ji nivîsên min ra vekir û bi coşekê ez teqdîr kirim. Ez jî bi vê pir şa bûm.

Bîrnebûna hêja, hemû kedkarên wê hezar car spasîya we dikim, hun her bijîn û Xwedê alîkarîye we bike..!

Ma we hay jê hewe, ez îsal li gund xanî çêdikim. Ez ê di hejmara din da qala wê bikim. Eger ku hosteyên we yê nas hene xarse xewerê bi min din, ê dawene hosteyên ji Merdînê rind in, nizam rast e, nizam şaş e? Tecrûbeyên we hene xarse, Xwedekî ji min ra bêjin.

Da xatirê we!

Ayşe Gul

EY ÊŞNO!

Xizan Şîlan

rojbaş êşno!
şevbaş êşno!
demxweş êşno!
merhaba êşno!
gelo êşên we ji hene wek êşên min
we
kirasê jana zirav
li laşê demsalên giyan
rapêça
stûna pišta xûzbûyî
qelişand
hêvî û bîranîn
spartin dîwarê keservedanê
we
qultequlta şereba eşqa îlahî
li min herimand
rondikên çavên melûl
ziwa kirin
kulîlkên ken û girînê
çilmisandin
gotin û hevok li ser ziman
lal kirin
we
şewqa çira odeya bêdeng
vemirand
tîra bêbextiyê
di kezeba min re anî xwarê
arzûyên xweşik bi saxî kuştin
çemên dilê bi coş berevajî
herikandin

we
zencîra tenêtiyeke kambax
li stûyê min aland
hest û xeyalên şîrîn
ji min dizîn
di axîn û nalînan de
gewrî li min fetisand
û toza serdeman li ser qedera min
daweşand
we
ez kirim şivanê kul û derdên
bêderman
birînen bêxewiya şereşên kor
bi min dan çêrandin
li jiyana xerîbistanê
zendê bîr û baweriyê
kelepçe kirin
ey êşno!
hûn her dem mêvanê
koşka dilê xizan in
ez ê
sifreya sebirê li ber we raxim
pariyên şîva eşan bicûn
û ava xeman daqurtînin
em ê bi hev re
hetanî serê sibê qala çîroka eşan bikin
ma ez ê rêhevaltî û dostaniya we
çawa ji bîr bikim
eyy êşno!

2017-06-18, Stockholm

Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da

-3-



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîf)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: **Kurd û Îslama Siyasî**

3 - Wezîr Yehya kurê Xalidê Bermekî

Yehya kurê Xalid yek ji kesayetiyan navdar yê malbata Bermekiyane. Gava Dewleta Ebbasî hate damezrandin, ew hên xortek bû di temenê bîst saliyê da û wî pêncî salên mayîn ji jiyana xwe di sîbera vê dewletê da derbas kirin. Keda wî di xizmeta vê dewletê da gelek rûmetdare, lê belê dawiya jiyana wî bobelateka mezin. Em ê ji pêra bi berfirehî li ser dawiya jiyana wî rawestin. Em ê niha bêhtir li ser taybetmendiya vê kesayetiye û keda wî di heyama xîlafeta Harûn El Reşîd da bidin ber çavan.

Jînenîgariya Yehya kurê Xalidê Bermekî:

Yehya kurê Xalid sala 120-ê goçî (738-ê z.) ji dayîk bûye û, bi bavê xwe ra di şoreşa dijî Dewleta

Umewî da û bûyerên ku di encamê da Dewleta Ebbasî hate damezrandin, beşdarî kiriye. Bê guman, ew ji bavê xwe va, ku wezîr bû, pir nêzik bû û ew jî mîna bavê xwe bi xurtî û tundî û di rêvebirina kar û baran da gelek serkeftî bû. Tiştê ku vê yekê piştrast dike ewe ku xelîfe Ebo Ce'hfer El Mensor ew di sala 158-ê goçî da kiribû waliyê Azerbeycanê. Yehya wê hingê 38 salî bû. Herêma Azerbeycanê di wê demê da ji ber du sedeman gelek girîng bû:

Yekem: Azerbeycan li ser tixûbên Qefqasiyê ye ku çepera yekser bû li hember gelên ne misilman.

Duwem: Hinek ji serekên Şî'iyên ji malbata Elewî Azerbeycan û herêmên derdora wê wek bingeha şoreşê li dijî Dewleta Ebbasî bi kar dihanîn.

Gava Muhemmed El Mehdî xîlafetî ji bavê xwe El Mensor wer-

girt, Yehya kire perwerdekarê kurê xwe Harûn El Reşîd daku wî perwerde û zana bike û wî hînî sincî û demînên baş û tîtalên bilind bike. Helbet, xelîfe razînedibûn ku kesek bibe perwerdekarê zarokên wan, heger ew ne xwediyê taybetmendiyên nirxdar û bilind bûya; ya here girîng ku ew ji kok û binyateka resen be, xwedî sincî û tîtalên bilind û zanîneka kûr be. Harûn El Reşîd bi navê "bavê min" gazî Yehya dikir û di pey ra ew kire wezîr. Ibin El Cewzî gotiye: "Gava Harûn bû xelîfe bi rastî jî mafê Yehya dayê û bi wî gelek serbilind bû. Dema behsa wî dikir, digot: „*Bavê min gotiye*“. Derxistina fermanan, hinartina nameyan û wergirtina wan spartibû wî" ¹.

Gava xelîfe Muhemmed El Mehdi sala 169-ê goçî (785-ê z.) wexer kir û kurê wî yê mezin Mûsa El Hadî xîlafetî wergirt, biryar da ku birayê xwe Harûn ji cihgiriya xîlafetê rake, û kurê xwe yî biçûk Ce'hfer bike cihgir. Rêberên dewletê û kesayetiyên mezin jî ev tişt pejirandin. El Hadî destpêkir gefan li Harûn bixwe û nirxên wî

di nava civatê da daxê. Wisa, xelkê xwe ji Harûn bidûrxist, tenha Yehya kurê Xalid û kurê wî her ji Harûn ra dilsoz man, û wisa xwe dan ber hêrs û xezeba xelîfe.

Harûn êdî ji El Hadî ra biryara xwe dabû ku dest ji cihgiriya xîlafetê berde. Lê belê Yehya piştgirî da wî û got divêt tu bi mêranî rawestî û dest ji mafê xwe bernedî. Hinekan ji mezinên rêberan El Hadî agahdar kirin ku Harûn dixwaze dest ji cihgiriya berde, lê Yehya pend û piştgiriya dide wî ku ew dest jê bernede. El Hadî rabû "ji Yehya ra gefa kuştinê şand û sûcê kufir di wî da". El Hadî destpêkir, zor li Yehya kir û ferman da ku ew bê zîndankirin û hindik mabû ku wî bikuje. Lê belê Yehya her li aliyê maf û dademendiyê rawestiya, pend li xelîfe kir û got: "*Ey mîrê bawermendan! Heger te li pêşiya gel soza xwe xwar, baweriya wan wê bi te nemîne. Lê heger tu birayê xwe wek cihgir bihêlî û piştî wî kurê xwe Ce'hfer bikî cihgir, evê ji hilbijartina kurê te ra piştgiriyeke xurt be*". Hîngê xelîfe got: "*Tu rast dibêjî, penda te raste û divêt ez wisa bikim*"².

¹Ibin Al Jauzi: El Muntezem fi Tarîx Al Muluk we El Umem, 9/188. El Zahabi, Siyer E'lam El Nubela, çapa Mueseset El Risaleh, 9/89.

²Al Tabari, Tarix Al Tabari, çapa 1387 goçî, 8/209 - 210. Ibin El-Esîr: El-Kamel fi Tarîx, çapa 1997, 5/265.

Û gava El Hadî sala 170-ê goçî (786-ê z.) wexer kir, bi xêra pîlana Yehya, Harûn El Reşîd xîlafetî wergirt. El Reşîd karê wezaretîyê da Yehya û mohra îmzekirinê jî da dest wî, destê wî di serdariyê da bi temamî berda û jêra got: "*Bavê min! Te ez bi bereketa xwe û zanîna xwe danîm ser textê serdariyê, ez jî kar û barê gel didim dest te, ez vê berpirsiyariyê ji stûyê xwe derdixim û dixim stûyê te, tu serdariyê bike, wek ku tu rast dibînî, kesê ku tu baş dibînî têxe kar û kesê ku tu nebaş dibînî bide aliyekî*"³.

Yehya dest bi karê rêveberiya dewletê di hemû waran da bi pisporî û awayekî rêk û pêk kir. Me gotibû ku asta wezîr di wê demê da wek asta serokwezîr di dema niha da bû. Yehya bala xwe baş dida kar û barê gel, cokên avê li ber çeman kolan daku aboriya welêt geş bibe û wisa xêr û bêra wezîr bi qezenca rêveberiyê hat. El Teberî gotiye: "*Ew û herdu kurên wî El Fedil û Ce'hfer ji bo pêşwaziya doz û daxzwazên gel heya bi nîvro rûdiniştin, li kar û barê gel*

û pêwîstiyên wan temaşê dikirin, rê li ber tikesî nedigirtin, ne jî xwe di pişt perdeyan de vedişartin"⁴.

Li ser taybetmendiyên Yehya hatiye gotin ku mirovekî aqilmend, xwedî baweriyên rast bû, arîşe, kêşe û pirsgirêk baş çareser dikirin, mirovekî comerd, dilpak, bi hurmet, bi heybet û dilsoz bû, bi aqilmendî û pisporî tevdiageriya, dilê wî gelek paqij bû, ew ji xwepe-sindan û pozbilindiyê dûr bû. Kesê ku xirabî jî pêdikir, ew dipexşand; ew xwedî zaniyariyeka bilind bû. Aqilmendiya wî di pend û şîretên wî da hatiye tomarkirin. Yek ji wan pend û şîretên wî ji zarokên wî ra ye: "*Pêwîstiya we, wê her dem bi nivîsevan, karker û alîgiran hebe. Divêt hûn alîkariyê ji kesên payebilind wergirin û bi her awayî xwe ji kesên nizim dûrbixin. Heger hûn qencyê bi kesên payebilind bikin, ewê wînda nebe û ewê nîrxên wê qencyê zanibin û her spasdarên we bin*". Yehya di sala 190-ê goçî (805-ê z.) da li bajarê Reqayê di zîndanê da wexer dike.

³Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/233. Ibin El-Esîr: El-Kamel fi Tarîx, 5/274.

⁴Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/233. Ibin El-Esîr: El-Kamel fi Tarîx, 1997, 5/274.

BELA REŞ

Li welatê me, li bajar û bajarokên Kurdistanê, zoremêr(qabadayî) hebûn.

Li cîh û warê ku dewletê walayîyek hukumdariyê li dûv xwe dihişt, qabaday tevdişgerîyan ku vê walayîyê dagrin û desthilatdariya xwe pêkbînin. Her çiqasî dixwestin xwedî salarî jî bûna, piraniyên wan, neheqî û çavsoşîya li hember hejaran nedipejirandin. Xwedî gurerek berz bûn. Bi çavfirehî, merdî û mêraniya xwe deng dane.

Etamoto

Serdema salên 1970î bû, çaxa ku laqabên şoreşgeran Pilingo, Keftaro, Guro, Şêro û navên din bûn -û heqê çaya wan di birîkên wan de tunebûn- gelek jî wan çaya Etamoto (Hetamoto) vexwarine. Di dawîya salên 1960î de, gava Apê Mûsa (Musa Anter) namzetê parlemana Tirkîyê herema Mêrdînê bû, Etamoto piştgirîya wî kir. Li gor saloxan Etamoto anha li Stanbolê dijî.

Serpêhatîyek min jî bi vî ciwamêrî re heye. Di destpêka payîza 1973a li Nisêbînê, dem dema ku şagirt xwe li lîseyê binivîsîn (qeydbikin). Mudîr ji Dêrika Çîyayê Mazî bû. Mudîr Bekir Beg fitûk derxistibû ku li Nisêbine he- ta wê rojê kesî ne bihîstibû û ne jî bêna bû.

Fermana ku Bekir Beg dabû navê wê KONTENJAN bû, ango ku çî şagirtêkî li dibistanê neyê nivîsîn. Kontenjan nema bû û hejmara xwendevanên li dervî kontenjanê jî xilbe bûn. Bê derfetî û nerazîbûna li salona dibistanê hîna li ber çavên min in.

Etamoto li xwe qewimand û ket oda Bekir Beg. Qederekî, ji nik Bekir Beg bêkêf û bi qahir derket û bi dengê xwe yê bilind got: "Ez nizanim çî bikim jî vî mudîrî. Me-sele dûrûdirej e, em kin lêxin. Me bi hev re fermana Bekir Beg têk bir û em bûn berpîrsiyarê (veli) gelek şagirtîyan.

Pișo Miheme

Qara Bela, Xirxir miço û belkî ji hemûyan bêhtir bê naskirin Pișo Miheme, hin jî qabadayên Amedê bûn. Li ser Pișo mihemed kitêb hatine lêkirin. Hez ji şoreşgeran dikir, dostê hejaran bû.

Serpêhatiyên wî gelek in. Dibêjin rojekê Pișo Miheme, li Deriyê Çiyê, li hember qahwexana Elo, dibin siya peykerê M.K. Atatürk de bêhna xwe vedide, xwe dirêj dike û di xew re diçe. Gava ji xew radibe û çiqasî li dore xwe meyze dike jî, pêlava xwe ya 8 qul, serîtûj û panî şkestî nabîne. Berê xwe dide peyker û wiha dibêje:

” Tu di muhareban (şer) de biserket. Me bahwerî bi te anî lê te nikarîbû pêlava 8 qul biparêzî. Ji îro û pêve navê te ma

BETON MISTO.”

Kesê ku ketîye zîndane dizane ku li qawîşan hiyeyarşî hene. Gelek caran diranên zêr nîşanî yektir dikirin. Nîşana ”nerazîbûnê”. Îca rojekê Pișo Mihemed diçe Deriyê Mêrdîne, li qahwexanê rûdinê û çayê dixwaze. Çaya wî dereng dimîne. Pișo Mihemed bangî xwediyê kahwaxanê dike, diranê xwe yê zêr

(li rêza paş) nîşanî xwediyê qahwexanê dide û dibêje: ”Ka çayê li kude ma?” Xwediyê qahwexanê wiha bersiva wî dide: ”Hîn dema xwe negirtîye! Wê bê!” Û hemû dinanên xwe nîşanî Pișo Mihemed dide. Lewra dinanên wî hemû zêr bûn. Pișo Mihemed bê deng û rûniştî li benda çaya xwe dimîne.

Husênê Qera

Qabadayên Siwêrekê babetek din in. Rojekê Husênê Qera, bi filozofî û zargotina xwe naskirî, çakêtê taximê bi êlek li ser pîyê wî, û meşek bi giranî ji çarşiyê tê. Çend xatûn li gasînê, li ber derî rûniştine û civata xwe gerandine. Kuçe ji keviran bû. Teqe teqa kundura wî ye. Xatûn lê temaşe dikin. Ciwamêr ”mûm” dibe. Qundira Husênê Qere ya serî tuj li kevirê ji yê kuçe dialiqe, dilukume û çakêtê wî dikeve erdê. Jin dikenin. Husênê Qere demança xwe ji ber xwe derdixe, surguyê lê dide û cercûrekî li kevîrê lê terpilîye wala dike.

Bela reş

Li nav tirkên jî zoremêr bûne mijara film û hunerê. Lê ne îro. Mafia cihê wan girtine. Mafia bi gelek

alîyên xwe cudane. Ne tenê waliya ku desthilatdarî li pey xwe dihêle dadigrin, her wiha mina dewletê jî tevdigerin. Çavsorî, bêbextî û xapandin karê wan in. Danûstandinên wan û maqamên dewletê xweş in.

Îca, rê bidin min ez ji we re çîrokekê lêkim. Ev çiroka li jêr serokê KURDÎ DERa Nisêbînê , Hekîmê mala Qetfo ji min re kat kir. Serpêhatî wiha ye:

Rojekê kerekî dajon axurek niv tarî û du quloçan peve vedikin. Mafia xelkê tênin ku têt derbixin ka ev çi core (lawir) heywan e. Kesên ku nerast nav lê bikra dê beş (ceze) bidana wan. Ceza jî 1000 qayme (bû. Xelk rêz kirin. Dora hat û yek kirin axo ku binere ka heywanê li axo çiyê. Ciwamêr zû derket.

- "Ma te çi dît?"

Ciwamêr ji xwe bahwer, bersiv da:

- Min kerek dît.

Mafia:

- "Te têt dernexist. Ne ker e, kiloçê keran tunene!" Û 1000 qaymî cezê didin wî.

Yê duhemîn dikeve axo û derdikeve û xwe bi xwe madem ne ker, gerek ga be. Berya ku mafia jê bipirse, dibêje:

- "Ga bû!"

Mafia:

- "Te têt dernexist, ne ga ye. Ma guhên gê wisa dirêjin?" Û 1000 TL ceza didin wî jî.

Dor têt yekî din, yê hejar. Dixwaze dilê xwe di cîh xe bê ka yên berî wî çigotîne û çi hat serê wan. Dûra jî diekeve hundurê axo û qederekê derdikeve der.

Mafia jê dipirse:

- "Ma te çi li axo dît?"

Hejar wiha bersiv dide:

- "Ne ker û ne jî ga ye. Hebe tunebe, bela reş e!"

Wêca...

Seyidxan Anter / Nisêbînê

Berî Referandûmê notên gera Kurdistanê^(*)

Vahit Duran

Însan dixwaze xeyal û hêviyên xwe bi çavên xwe bibîne û bijî. Min jî her dem xwestiye li warekî ku bikanibim ziman û çanda xwe bi awayekî azad bînim ser zimên bim. Wekî kurd birînên me yên kûr hene. Axa me ya ku em hebûna xwe deyndarê wê ne hatiye dagirkirin. Di navbera me de sînor danîne, nasnameyên cûrbecûr kirine beriyên me, zimanên xerîb di devê me de bi cîh kirine.

Ev demek e min dil hebû, ji vê atmosfera difetisîne derkevim, nefeseke kûr bikşînim, ji cihekî din li tiştên diqewimin mêskim. Wekî qerfa dibêje; „Dikare bibe merhema birînê“ min qerar da herim axa azad ya welêt. Perçeyê başûrê welatê me ev demek e azad bû.

Li ser bingeha xwe rast-şaş dimeşiya. Gerek min ew bidîta û hewayaya wê bikişanda hundirê xwe. Wê bi min xweş bihata. Ji nas, dost û hevalan kesên çûbûn Kurdistanê azad hebûn. Lê min dixwest bi çavên xwe bibînim hîs bikim û bijîm. Bi salan e pirsên ku di serê min de di heqê Kurdistanê de hebûn, min ê bi vê wesilê belkî bidîta.

Di vî warî de hevalê min yê delal Mehmet Tanriverdi hat hewara min û pêşniyar kir ku em bi hev re herin serdana Kurdistanê bikin. Di wê demê de çend randevuyên KGD (Civata Kurd Almanya), ku Mehmet rêvebir û ez bi xwe jî endamê wê me rastî hev dihatin û me bi wî awayî dest bi haziriya xwe ya gera Kurdistanê kir.

Li Kurdistanê rojên me pir bi lez û bez derbas dibûn. Di serî de me bi wezîrê derve yê Kurdistanê Federal birêz Felah Mistefa, bi parêzgerê Kerkûkê birêz Dr. Necmeddin Kerim û bi nûnerên KDP, YNK û Goranê re hevdîtînen cuda pêkanîn. Di eniya şer ya Musilê de me serdana pêşmergeyan kir. Me şopa erîşên hovane ya DAÊŞê ajot. Li Başûr em rastî gelek şexsiyetên ji Bakûr ku li wir bicîh bûbûn hatin. Me gelek pirsên cuda ji wan kirin û bersivên wan me bi hesasiyet not kirin.

Başûrê welatê me di arîfeya dewletbûnê de ye. Min dixwest fam bikim ku gelo zanebûn, huner û derfetên elîta siyasî ji bo wê yekê têr dike yan na. Di destpêkê de dix-

^(*) Ev nivîs ji tirkî Ecevit Yildirim vergerandiye kurmancî



Li ser gora Mistefa Barzanî- bi xelkê Urmîye va

wazim binê nuqteyekê xêz bikim. Ji ber kêmbûna demê dibe ku belkî çend tişt di ber çavê min reviyabin. Lê belê ji rexneyên ku di vî warî de bêne kirin ez ji niha de rêz jê re digrim. Tevî lêborîna xwe dixwazim vê têbiniyê destnişan bikim; baweriya min bi çavdêrî û hişmendiya min heye. Ez hewl didim ku destûrê nedim diyardeyên xwe nespêrin daneyên konkret û objektîf. Berî ku ez şîrove yan jî tespîtekê bikim, raman û nêzikatiyên cuda li ber çava digrim. Ger têbiniyan li ber ronahiya vê nêzikatiyê bixwînin ezê kêfxweş bibim.

Di 25ê puşpera 2017an, danê nîvro saet 14an em li balafîrgeha Hewlêrê peya bûn. Piştî kirarên resmî em ji balafîrgehê derketin.

Germahiyekê li ruyê me da. Li Almanya baran dibarî. Em hinekî germ bûn. Te digo qey bi bexşandina germahiya xwe, bajarê qedîm yê çar hezar salan ji me re dibê; „Hûn bi xêr hatine!“



Li gundê Berzan, gora Mistefa Barzanî

Balafirgeh hîn ecer ava bûye. Tirkbûna mîmarê wê ji şibandina Esenboxa ya Enqerê diyar dibû. Yên me, bi tevî rexneyan bi nîv mîlyar dolar ev balafirgeha dewasa li deşta Hewlêrê dane çêkirin. Pîsta daketina xwarê li ser standartên navnetewî ye. Dewletên Yekbûyî Yên Emerikayê berî çend rojan çekên giran ku ji Rojava re şandin ji vir aniye xwarê.

Li ber deriyê balafirgehê dostê me Ali Haydar yê dersimî em pêşwazî kirin. Bi ereba wî em hatin navendê. Çend nas û dostên me li benda me bûn. Li dû çend saetên germ û hestiyar me plan û programa xwe careke din ber çava re derbas kir. Em ê ji Hewlêrê herin Kerkûkê û ji wir jî derbasî Silêmaniyê bibin.

Di berdewamiya wê de jî em ê herin Duhok, Mûsil, Amediyê, Laleş, Geliyê Elî Beg û herêma Barzan. Destpêk a Kerkûkê ye. Ji ber ku parêzgerê Kerkûkê birêz Dr. Necmeddin Kerîm li benda me bû. Em dixwazin bi lez bi rê kevin. Motivasyona me dîtina Ala Rengîn a ku li Kela Kerkûkê hatiye daliqandin e. Çûnhata me bi taksiyê ye. Otobus yan jî trêna tune ne.

Hewlêr ecêb hatiye guhertin. Hewlêra ku di sala 2003an de wekî bajarekî biçûk bû, niha wek metropolêkî gir û girs li hemberî me disekinî. Nifusa wê ji du mîlyona derbas kiriye. Tê gotin; ji ber ku bajar li deşteke pan û fireh hatiye avakirin, herî kêma salê du cara bi ba û bahoza qûmê re rû bî rû dimîne. Bi projeya kemera kesk li der û dora bajêr dar hatine danan. Kela Hewlêrê ya ku ji dîrokê re muşahîdiyê dike hinekî hatiye restorekirin. Di sektora avahîsaziyê de teqînek berbiçav heye. Li Hewlêrê di deh salên dawî de sêsedhezâr avahî hatine avakirin. Tê gotin; Piraniya wan bi buhayêke cuzî li gel hatine firotin. Guhertina demografîk bandor li ser nasnama bajêr ya civakî, çandî û aborî jî kiriye. Di bazirganî û hilberînê de bandora ereb û tirkmenan bi qasî berê tune ye. Zanîngehan barî avahiyên ecer kirine. Diyar e ku hikûmet girîngiyê dide perwerdeyê. Berpirsiyarên perwerdeyê di hevdîtinan de anîn ziman, ku hîn gelek kêmasî hene.

Zimanê resmî kurdî ye. Eger guhê we ji zaravayên kurdî yên bingehîn re ne xerîb e, hûn di kanin bi awayekî rihet xwe îfade



Dr. Saleh, Vahîd Duran û Orhan Kaya- Hewlêr

bikin. Erebiya ku demekê li vir zimanê resmî bû, niha bi derde canê xwe ketiye. Pedagogekî hewlêrî bi pesindarî digot; niha li Kurdistanê nifşa di bin sih û pênc salî de bi erebî qet nizane. Hemû ragihanda xwe bi zimanê dayikê kurdî dikin. Em dikanin bêjin di warê çand, huner û medyayê de jî ronasansek tê jiyandin.

Çapemenî gelekî xurt e. Li cem kanalên TVên netewî TVên lokal jî hene. Di xurtkirina zanebûna netewî de rola medyayê jî me not kir. Partiyên heyî Başûr di nav hev de qey par ve kirine. Li Hewlêr û Duhokê KDP, li Silêmanî û Kerkûkê YNK bi bandor in. Goran hema bêje li her derê heye, lê giraniya wan li Silêmanî xoy dikir.

Siyaseta xwe bêhtir li ser dijberiya KDP û YNK dimeşînin. Şiklê kar û xebata partiyên Başûr dişibe kar û xebata Sovyeta berê û rêveberiya Çînê. Li cem burokasiyê mekanîzma partiyên jî heye. Pir tişt encax bi erêkirina wan pêk tê. Merî hebûna parvekirina rantê ji wan rexneyan jî fam dike.

Nifûsa Kerkûkê ji 1,5 milyonî derbas kiriye. Di rojên DAEŞê Musil dagir kiribû, arteşa Iraqê bajar ji nişka ve terikandiyê. Pêşmerge jî li ser wê êrişên wan şikandiyê kontrola Kerkûkê xistiye dest xwe. Niştecihên ereb ên Kerkûkê wekî berê hewayê wan nemaye. Bi derdê ewlehiyê ve rû bi rû ne. Bi alîkariya DAEŞê tînan tawanbarkirin. Rewşa erebên Kerkûkê bandor li tirkme-

nan jî kiriye. Ew jî mecbûr mane pozisyona xwe di ber çava re derbas bikin. Di nav tirkmenan de trenda herî xurt ev e; ku bi kurdan re di nav têkiliyek baş de bin.

Dû re em çûn cem parêzgerê Kerkûkê birêz Dr. Necmeddin Kerîm. Li hemberî me kesayetiyekî ku hakimê zaravayên kurdî yên bingehîn, xurt û zana rûniştibû. Hevok û pirsên min yên bi devoka reşiyên jî fam kir û yek bi yek bersiva wan da. Haya min ji biyografiya wî kêr zêde hebû. Lîse li Kerkûkê, fakulta TIPê li Musilê, pisporiya noroştrojiyê jî li zanîngeha George Washingtonê kiribû. Di xortaniya xwe de teve refên pêşmergeyan bûbû doktorê Mele Mistefa Barzanî yê taybet bû. Niha jî parêzgerê Kerkûkê bû. Me li ser pir mijarên rojane deng kir. Li ser Kerkûkê û giştî Kurdistanê yek bi yek em agahdar kirin. Me jî wek şandeya Civata Kurd li Almaniya ew vexwendî sempozyumek li Almaniya kir. Bi dilgermî vexwendnameya me qebûl kir. Bi armanca serdana gora Noşîrvan Mistefa ku li Silêmanî bû me xatir ji hev xwest.

Li ser mirina Noşîrvan Mistefa hefteyek derbas bûbû. Binaxkiri-

na li girê Zergeteyê wasiyet kiribû Noşîrvan Mistefa. Merî û endamên partiya Goranê li ser tirba wî bûn. Silêmanî metropolekî dewasa ye kurd e. Diyare ku navenda huner û edebiyatê ye. Zanîngeha wê zindîbûnek daye bajêr. Min nedizanî ku zarava soranî viqas dewlemend e. Wekî xelkê Duhok û Hewlêrê xelkê Silêmanî jî xwedî nezaket bûn. Dengkirina wan tim bi „kakecan“, „emrêcan“ û „dilekem“ dest pê dikir. Li Silêmanî bandora şer wekî bajarên din xoy nedikir. Jiyana rojane di nava gel de hakim bû.

Duhok bêhtir dişibe bajarên bakûrê Kurdistanê. Nêzîkbûnek di warê çand û zimên de heye. Zaxo, Laleş, Şêxan, Bamernî û Amediyê nêzîk in. Ji ber wê jî fonksiyona navendê dilîze. Nifûsa wê di du salên dawî de bûye dubar û gihîştîye milyon û nivekê. Gelek penaber ji Şengal û Rojava hatine Duhokê. Di pêşerojê de qala Duhokê wê bê kirin. Em dikanin bêjin ji ber rewşa wê ya coxrafîk û çavkaniya însanan ve stêrka Duhokê li ber biriqînê ye. Elîta siyasî projeyên mezin teşviq dike. Zanîngeha Emerîkayê ku deh km derveyî bajêr li ser 450.000 m² ha-



Zaggeaz Perwarî, Vahit Duran û Kak Zerewanî

tiye avakirin vê pêşbinîyê dide dest. Kurmancî her çiqas di nav soranan de dibe cihê qerf û henekan jî sade û paqij e.

Li Duhokê dixwazim çend rojan bimînîm. Armanca min çûyina eniya şer cem pêşmergeyan e. Du sal in li vir şer heye û ez dixwazim şervanên li eniyê şer dikin nas bikim, bi wan re deng bikim. Bûyeran carekê jî dîrek ji wan guhdar bikim. Vê hizra xwe min bi kak Orhan Kaya ve parve kir. Gava DAEŞê êrîş kir kak Orhan Kaya dev ji kar û xebata xwe berda û ji wê rojê vir de li enîya şer cem pêşmergeyan mil bi mil şer dike. Kak Orhan deh sal in li Başûr dijî. Li Başûr bazirganiyê dike. Ji navçeya Hezo ya bi ser bajarê Êlihê ye. Di heman demê de nûnerê

Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) ya Başûrê Kurdistanê ye. Kak Orhan daxwaza min qebûl kir û ez bi Qomutanên Pêşmergeyan yê eniyê kak Zêrevanî û kak Zagros ve dam naskirin.

Kak Zêrevanî 70 salî ye. Emrê xwe di nav refên pêşmergeyan de derbas kiriye. Niha teqewut bûye. Lê vala nasekine. Bi her tiştî ve mijûl e. Kak Zagros jî li enîya Musilê pêşmerge ye. Daxwaza me qebûl kirin, me qirara randevuyekê girt û em ji hev veqetiyên.

Dora din ya royê em ber bi Mûsilê ve bi rê ketin. Em ê herin Wankê ku 80 km ji bendava Mûsilê dûr e. Li vir çemê Dîcleyê wek sînorekî xwezayî ye. Li hêla din ya Dîcleyê gundên Ereban hene. Li wan gundan DAEŞ hîn jî aktîf

e. Em di dehan gundên wêrankirî re derbas bûn. Qomutan Hecî Necmedîn ku berpirsiyarê yanzdeh qereqolan e, em bi dilgermî pêşwazî kirin. Li cem wî çend qomutanên din jî hebûn.

Bi tevî wan qomutanên û ereba zirxkirî em li eniya şer geriyan. Me bi pêşmergeyên li eniyê sohbet kir, guhdar li hekatên wan yên şer kir. Di sohbetê bi qomutanên pêşmergeyan ve min ferq kir ku di heqê şer de tu zanebûna min tune ye. Min nizanî bû ku şer ewqasî mezin e. Ji ber wê jî qalkirinên wana min yek bi yek not kirin. Hinekan jî wan dixwazim bi we re par ve bikim:

"Di 10ê hezîrana 2014an de DAEŞê Mûsil dagir kir. Artêşa Iraqê ku bi 50.000 leşker û çekên giran li hember DAEŞê nesekinî û bajar terikandin. Piştî wê artêşa Iraqê jî tevahiya herêmên bi minaqeşe yên kurdî vekîşiya. Pêşmerge jî li ser wê di serî de bajarê Kerkûkê dest danî ser hemû herêmên kurdî. Di destê me de çekên herî giran roket û doçka bûn. Yên din gî qilêş û çekên mina wê bûn. Li hemberî me jî hêzeke eskerî ya dewasa ku kesî bi hêza wê nedizanî hebû. DAEŞê piştî Musilê di 14ê hezîranê de li nêzikî bajarê Kerkûkê herêma Hazirê avêt ser ce-

bilxaneyê Gizaniyê û dest danî ser hemû çekên tê de.

Di 16ê hezîranê de bajarê Tel Aferê bi dest xist ku piraniya niştetihên wê tirkoman in. Ji wir jî DAEŞê berê xwe da Maxmûrê. Li Hamam Elî, Suska, Gwêr û Dugirê şerên giran di nav DAEŞ û pêşmergeyan de qewimîn. Pêşmerge ket tengasiyê û xwe paş ve kişand. Piştê bi alîkariya HPG û milîsên herêmî pêşmerge kontrola herêma di-sa bi dest xist.

Di 1ê tebaxê de nivê şevê DAEŞê vê carê jî êrîşt Zumarê kir. Bi şev şerekî pir giran çêbû. Dora din ya royê bi alîkariya eşîrên ereban erîşa xwe xurt kirin û di encam de Zumar û Rabia ketin destê DAEŞê. Di wî şerî de qomutanên pêşmergeyan emrê vekîşandinê dan. Çend pêşmergeyan guh nedan emrê qomutanên. Şer kirin û hatin qetilkirin. Her du qomutan dû re hatin mehkemekirin.

DAEŞê di 3ê tebaxê de bi alîkariya eşîrên ereb êrîşt Şengalê kir. Şengala ku der û dora wê bê parastin ma di demek qut de ket. Pêşmergeyan xwestin gel ber bi çiyayê Şengalê ve tahliye bikin. Gotina ku pêşmerge gel li dû hiştîye û reviya ye qet ne rast e. Pêşmerge bi gel ku hejmara wan bi qasî 400.000 kesî bû xwe paş ve



Kak Necmedîn Vahit Duran û Kak Zagros Perwarî

kişand. Êrişa hovane û qetliama ku li birayên me yên êzidi hatiye kirin, li gundên Koço, Xatimî, Til keseba Kevin, Sêxanî û Azimî hate kirin. Va gundana ji bi gundên ereban ve di hundirê hev de ne. Birayên me yên êzidi bawer nedikirin ku cîranên wan yên ereb wahşetêke wer li wan bikin. Banga tahliyekirinê qebûl nekiribûn. Birayên me yên êzidî ku hatin qetilkirin ji wan gundan bûn.

Li hêla din, pêşmergeyan birayên me yên êzidî bi tenê hiştin reviyên. 7 YPGyîyan 200.000 êzidî ji qetliamê xelaskirin. Pêşmergeyên zikgir ku nizanin şer bikin, şûna ku şer bikin, xaniyên xwe yên ku bi pereyên petrolê standine difikirin ne rast in. Ji propagandayeke erzan wê de tu wateya xwe tune ye. Nêzikî duhezar hevalên me şehîd ketine. Bi

hezaran hevalên me yên birîndar hene. Rizgarkirin ewqas hêsan bûya 7 heval wê ji nava me derbiketana. Welhasil di dawîya sala 2016an de bi piştgiriya hewayî ya Dewletên Yekbûyî Yên Emerikayê û bi desteka Almanya ya bi roketên Milan me herrekata Şengalê da destpekirin.

Li eniya herî pêş serok Barzanî bi du lawên xwe û ji malbata Barzaniyan 2.500 pêşmerge bi tevî zêrevanan 10.000 pêşmerge tevî herreketa Şengalê bûn. Ji Zumarê bigrê heta Şengalê me ji destê DAEŞê xelas kir."

Nêrîn û nêzîkbûna pêşmergeyan kêm-zêde bi vî awayî ye. Ya ku min ji tiştên dîtî û bihîstî derxistî ev e; em kurd wekî av û nên muxtacî çavkaniyên nûçeyan yên bêalî ne. Erê wekî „Av û Nên“.

Amediyê, Laleş û Zaxo di serê cîhên ku merî lê bigere tên. Geliyê Elî Beg dişibe Arizona ya Emerikayê. Tu dibê qey filmên dîrokî di pêşerojê de li vir werin kişandinê. Herêma Barzan orîjînalîteyeke bi serê xwe heye. Di taybetmendiya coxrafya wê, di warê çand û di paqijîya kurmanciya wê de xwe derdixe der. Kultura eşîrtiyê desthilat e û heta dikanim bêjim çavkaniya pesindariyê ye jî.

Gora nemir Mele Mistefa Barzanî her saetê ji serdanê re vekirî ye. Ji her derê Kurdistanê kom bi kom ji bo serdanê tên ser gora nemir Mele Mistefa Barzanî. Koma rastî me hatî ji Êrmiyê hatibû.

Li dawiyê

Birayên me yên Başûrî ji sê bajarên biçûk sê metropolên mezin ava kirine. Di pêşerojê de ev her sê metropolana namzetên stûn û bingeha dewleta sebixwe ne. Cudahiyên wekî coxrafya, çand û ziman wekî berê bandora xwe nemaye. Cudahiyên berê şûna xwe ji nasnameyeke muşterek re dihêlin. Herêmên bi mînaqêşe ku di resmîyetê de girêdayî Bexdayê ne di pratîkê de hatiye çareserkirin. Rewşeke de facto heye. Bi referandûmê rewşa de facto wê

resmî bibe. Berxwedana li hember DAEŞê di zanebûna netewî de roleke erênî listiye. Têkiliyên bi ereban re li ser vê bingehê ji nû ve di çava re tên derbaskirin. Konseptên dewleteke muşterek û ya bi hev re jiyankirinê hema bêje tu alîgirên xwe nemane. Bi bawerî û rabûn-rûniştinên xwe re di nav têkiliyeke aştiyane de ne. Têkiliyek li ser bingeha rêzgirtinê ya bi xristiyan, êzîdî, feylî û yaresanan ve heye. Gelê me yê Başûr xwedî xwebaweriyek xurt e. Ez bawer dikim, di xwebawerîya gelê me yê Başûr de aîdiyeta eşîrtiyê û mezheba şafîbûnê roleke bingehîn dilîze. Ji ber ku kurdên feylî ji mezhebaş şiyane, berê xwe vê demê ber bi Bexdayê ve kirine. Tê gotin, ku eger Hewlêr siyaseteke baqil bimeşîne wê ew jî berê xwe ber bi Hewlêrê ve bikin. Nifûsa wan nêzîkî du mîlyona ye. Bi piranî li coxrafya di nava Hewlêr û Bexdayê de bi cîh û war in.

Di dîplomasiyê de çend tengasiyên Kurdistanê hene. Astenga bingehîn derveyî Dewletên Yekbûyî ên Emerîkayê têkiliyên stratejîk yên dewletên mezin bi Enqere, Tehran û Şamê re ne. Em dizanin ku ew naxwazin wan têkiliyên xwe riske bikin, lê wê yekê li ba yên me jî pêşqebûliyek bi xwe re aniye. Wek



Orhan Kaya, Dr. Arzu Yılmaz, Mehmet Tanriverdi, Vahit Duran, Zagros Perwarî

mînak; li Almanya zêdeyî milyonek kurd dijîn. Li hember pîrsa me ya ku hûn çima bi wan re mijûl nabin, tu bersiva wan tunebû. Tu politikayeke wan ya ji bo kurdên bakûr tune ye. Weng xoy dike ku birayên me yên başûrî di rêya ku heta îro de meşiya ne ber bi dawiyê hatine. Ew destpêkeke ecer e. Karê wan hîn jî

zortir bibe. Lê belê ji hêla huner û pêşbînîyê ve potansiyela wan heye, ku bikanibin ji heqê astengiyên li pêş wan derkevin. Şaşîtiyên mezin nekin, bes e. Em dikarin bi dilekî rihet li sernivîsa “Notên gera Kurdistanê”, „Rêya we vekirî be“ zêde bikin.

Tîrmeh 2017



Vahit Duran, Dr. Necmeddîn Kerim û Mehmet Tanriverdi

Pîrozbahîya bîstsaliya kovara Bîrnebûnê



7ê payîza navîn
li Restavanga Parabolênê,
Rudsjöterrassen 2, Haninge çêdibe.

Bi xêr bên!

Berhemeka nû ji weşanxaneyê APECê

Mem û Zîn a Ehmedê Xanî

Ji nû ve nivîsandin: Mistefa Uzun

Îlustrasyon: Wolf D. Köpfer


Weşanxaneyê Apecê, 2017

ISBN: 978-91-88333-20-9

Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî yek ji helbestvanên herî navdar yê kurdan e. Weha tê bawerkirin ku ew sala 1651ê li gundê Xanê yî bi ser Colemêrgê ve hatiye dinê. Ehmedê xanî di jîyana xwe ya kin de pir berhemên edebî nivîsandine. Berhemên ku îro li ber dest in ev in:

- 1- Mem û Zîn
- 2- Eqîda Îmanê
- 3- Nûbihara Biçûkan



Mem û Zîn îro di nav kurdan de wek şahasera edebiyata kurdî tê nasîn. Ew di vê pirtûka xwe de bi evîndarî qala xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî dike.

Li gor tê bawerkirin Ehmedê Xanî sala 1707ê li bajarê Bazîdê dimire. Gora wî li vî bajarî li kêleka Qesra Îshaq Paşa ye. Îro jî kurd derin tewafa gora Ehmedê Xanî û vî helbestvanê mezin bi bîr tînin.

